# Li Kurdistanê gef li kurdan xwar

“Serokwezîrê tirk Bînalî Yildirim li Hewlêrê gef li kurdan xwar, rêxistinên kurdan wek terorîst û dagirker bi nav kirin. Barzanî jî spasiyên xwe anîn ziman”



Serokwezîrê tirk Bînalî Yildirim ji Bexdayê derbasî Hewlêrê bû. Yildirim bi serokê Hikumeta Herêmê Nêçîrvan Barzanî û bi serokê PDK'ê Mesûd Barzanî re civiya. Piştî hevdîtinê Mesûd Barzanî û Yildirim derketin pêş kamerayan û daxuyaniyeke hevbeş da çapemeniyê. Yildirim destkeftiyên gelê kurd hedef nîşan dan û têkoşîna azadiya kurdan wek terorist û dagirker bi nav kir, gef li PKK, PYD û YPG'ê xwarin. Yildirim wiha got: “Belavbûna PKK'ê ya li Şengalê qet nayê qebûlkirin. Ne tenê meseleya Tirkiyeyê mesele ya me ye jî. Em nikarin çavên xwe ji xebatên PYD'ê re bigirin.” Her wiha hat ragihandin ku leşkerên tirk dê ji Başîkayê vekişin û Tirkiye û Iraqê li ser 9 xalan li hev kiriye... R - 4/7

ROJEVA Medya

9 Çile Duşem 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 60



## Êzidiyan bang li PKK'ê kir

Civîna Koordînasyona Civaka Êzidî ya Demokratîk li çiyayê Şengalê bi beşdariya 60 delegeyên ji tevahiya Kurdistanê, Ewropa, Rûsya û Ermenistanê pêk hat. Êzidiyan bang li PKK'ê û cîhanê kir û wiha got: “Pêwîstiya vê civakê bi we heye. Divê tirs û fikarên me civaka êzidî bên fehmkirin. Em garantoriya saziyên navneteweyî yên mîna Neteweyên Yekbûyî û Yekitiya Ewropayê dixwazin.”... R7

# Herî zêde ji jinan ditirsin


**DÊ DAXWAZA WAN BI CIH WERE**

Îro salvegera qetilkirina sê jinên şoreşger; Sakîne Cansiz, Leyla Şaylemez û Fîdan Dogan e. Sazî û rêxistinên kurdan bi daxuyanî û çalakiyan jinên şoreşger bi bîr anîn. KCK'ê diyar kir ku ev êrîş nîşan dide ku dewleta tirk a mêtinger ji jian ditirse û dê daxwaza wan a azadiyê bi cih bînin.



**KOMKUJÎ SEDEMA ŞOREŞÊ YE**

Komalên Jinên Ciwan (KJC) ragihand ku bîranîna her sê jinên şoreşger ên kurd rêya wan ronî dike û komkujiya Parîsê sedema şoreşê ye. Gerîlayên HPG'ê destnîşan kir ku xeta Sarayan tu carî têk naçe. Li Amed, Hewlêr, Silêmanî, Ewropa û gelek navendan meş û bernameyên bîranînê hatin lidarxistin ... RÛPEL - 2/8



## Gerîla hetkarî dano êzidîyan

Endamê Konseyê Caardişî yê KCKyî Mustafa Karasuyî va ‘Tirkîya vizêr Başîka de seba Mûsilî tehdît bîye’ û qiseykerdişê xo wina domna: “Nêşîna Mûsil de bikero, ewro vanî ma senî PKK Şengal ra biveji? Ewja de PKK çin o û gerîlayî seba hetkarîdayîşî şîyî Şengal. Êzidîyan meclîsê xo û dima ra YBŞ awan kerdî. Ewja de YBŞ û gerîlayî estî.” ... R11

**Ronahî û bihar nêzîk in...** Nivîsa Mizgîn Ronak R3





## Bîrdariya Roboskê di dilê mirovahiyê de ye

Dewleta tirk bîrdariya ku ji bo bîranîna 34 kesên ku li Roboskê hatibûn qetilkirin, rakir. AKP dixwaze komkujiyê bide jibîrkirin lê mirovahî tu caran komkujiyê ji bîr nake


Di 28'ê kanûna 2011'an de li gundê Roboskê yê navçeya Qilabanê ya Şirnexê ji aliyê balafirên şer ên artêşa tirk ve 34 kesên ku piraniya wan zarok bûn, bi bomberanê hatin qetilkirin. Dewleta tirk û serokomarê tirk bi awayekî aşkera komkujî parast û tehemûlî bîrdariyan jî nakin. Bîrdariya ji bo bîranîna kesên ku di qetlîama Roboskê de hatin qetilkirin beriya 4 salan li Amedê hat danî bi fermana qayûmê şaredariya Peyasê ji aliyê polîsan ve hat rakirin û mermerê ku navê 34 sivîlan li ser hatibû nivîsandin jî hat parçekirin. Her wiha qeyûmê şaredariya Bajarê Mezin a Amedê peykerê li ber şaredariyê rakir. Qeyûmê Amedê çend roj berê jî peymana şanogeran nû nekir û tabelaya kurdî rakiribû... RÛPEL - 6

## Dengbêj Canşah; jiyaneke di tehma kilaman de

Di nav kurdan de dengbêjî xwedî cihekî girîng e. Gelê kurd bi dengbêjiyê destanên xwe yên qehremaniyê gihandine roja me ya îro. Dengbêj Mihemedê Canşah.. RÛPEL - 9

## Gav bi gav ber bi Reqqayê ve

- Di operasyona Xezeba Firatê de şervan gav bi gav nêzîkî Reqqayê dibin û herî dawî 25 çete hatin kuştin



- Ji bo rizgarkirina Reqqayê operasyona Xezeba Firatê bi serkeftî didome. Êrîşên komên çete yên DAIŞ'ê yên li dijî gundên Til Semen û Silis Xinezê hatin şikandin. Di encama pevçûnan de 25 çete hatin kuştin û tevî 2 tang û panzeran gelek wesayît jî hatin rûxandin... RÛPEL - 5

www.arsivakurd.org

## Sakîne û hevalên wê li Kerkûkê hatin bibîranîn

**SAKÎNE CANSIZ, FÎDAN DOGAN Û LEYLA ŞAYLEMEZ** ên ku di 9'ê Çileya 2013'an de li paytexta Fransa Parîsê hatin qetilkirin, li bajarê Kerkûkê yê başûrê Kurdistanê bi pêşengiya Tevgera Jinên Azad a Kurdistanê (RJAK) bi aktîvîteyekê hatin bibîranîn. Di aktîvîteyê de endama meclisa RJAK'ê Perwîn Hesen axivî û destnîşan kir ku Cansiz di tevahiya jiyana xwe ya têkoşînê de di hemû şert û mercan de, li ku dibe bila bibe her tim rola pêşengtiyê kiriye û jineke şoreşger bû û ew sembola berxwedana Amedê bû. Di bîranînê de ji bo 3 jinên şoreşger find hatin pêxistin û sînevîzyoneke têkoşîna Cansiz û hevalên wê tîne ziman, hat pêşkêşkirin. Bîranîn bi dirûşmên 'Jin Jiyan Azadî' bi dawî bû. KERKÛK - ROJNEWS






# Komkujiya Parîsê sedema ŞOREŞÊ YE

**KCK û Komelên Jinên Ciwan der barê sê jinên şoreşger de daxuyanî dan û hat gotin ku ew ê hesabê komkujiyê bi pirsin û dan zanîn ku komkujiya Parîsê sedema şoreşê ye. Gerîlayên HPG'ê jî gotin ku ew şagirtên Sakîne Cansiz in**

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê bi wesîleya salvegera komkujiya Parîsê daxuyaniyeke nivîskî weşand. KCK'ê her sê jinên şoreşger bi bîr anîn û destnîşan kir ku dê daxwaza wan a azadiyê pêk bînin.

KCK'ê diyar kir ku Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez, ji ber ku dildariya azadiyê ya Tevgera Azadiyê ya Kurd di asta herî bilind de temsîl kirin, hatin kuştin û wiha hat gotin: "Ev êrîş di şexsê hevala Sakîne de hem li dijî PKK'ê, hem jî li dijî xeta azadiya jinan a Rêber Apo pêk anîn. Mêtinger, mirina xwe di xeta PKK'ê û dildariya azadiya jinan a vê xetê de dibînin. Ev êrîş nîşan dide ka dewleta tirk a mêtinger herî zêde ji çi ditirse." KCK'ê destnîşan kir ku hatiye îspatkirin ku ne PKK ne jî xeta azadiya jinan tu carî nayê têkbirin, kuştin û tunekirin û ev tişt hat ragihandin: "Piştî şehadeta hevrê Sakîne, Fîdan û Leyla, biryardariya azadiyê ya têkoşîna me, ya jinan, ciwan û tevahiya gelê me zêde bûye ku em têkoşînê mezintir bikin û daxwaza azadiyê ya van hevrêyan bi cih bînin."

KCK'ê da xuyakirin ku bi kujerê her sê şoreşgeran bi rengekî nediyar miriye û bi vî rengî derfeta aşkerabûna hêzên li pişt vê komkujiyê û hesabdayîna wan li pêş raya giştî ya cîhanê ji holê hatiye rakirin û ev tişt hat destnîşankirin: "Desthilatdariya AKP'ê û dewleta tirk a mêtinger berpirsyarên vê komkujiyê ne. Em ê bi pêşvebirina têkoşîna azadiyê, bi azadiya Kurdistanê û demokratîkkirina Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn hesabê vê komkujiyê bipirsin. Heta ku dildariya azadiyê û sekna têkoşer a Sarayê ruhê vê tevgerê be, tu êrîş bi ser nakevin. Serkeftin dê ji sedî sed a tevgera me ya azadiyê be." *BEHDÎNAN - ANF*

## 'Em şagirtên heval Sara ne'

Gerîlayên HPG'ê têkildarî komkujiya Parîsê ya ku sê jinên şoreşger Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez qetil kirin, axivîn û komkujî lanet kir.

Gerîlayê HPG'ê Çekdar Armanc diyar kir ku divê komploger baş bizanin ku xeta Sarayan tu carî têk naçe û wiha got: "Em jî wek milîtanên Rêber Apo sond dixwin heta dilopa xwîna xwe ya dawîn li çiyayên azad û li hemû deverên dinyayê di xeta Sarayan de em ê têkoşîneke pir mezin bidin." Mordem Baz destnîşan kir ku bi xwîna şehîdên xwe ew soz didin ku heta tola heval Sara û hevalên wê hildin dê ev têkoşîn heta serkeftinê bidome. Aso Zagros jî diyar kir ku Sara ji bo wan sedema berxwedanê ye. Karker Medya jî anî ziman ku Sara hêza jinên şoreşger bû û got ku ew şagirtên Sarayê ne. Kendal Karker jî herî dawî got ku piştî şehadeta Sarayê bi hezaran ciwan tev li nav PKK'ê bûne, ev jî nîşan dide ku bi yên ku dixwestin di şexsê Sarayê de têkoşînê têk bibin, ew têk diçin. *BEHDÎNAN - ANF*





## Bi pêşengiya wan têkoşîn li her derê belav bû

Hevparên Tevgera Jinên Azad (TJA) ji bo siyasetmedarên jin ên kurd Sêvê Demîr, Pakîze Nayir û Fatma Uyar ên li Sîlopiyê û Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez ên li Parîsê hatin qetilkirin li avahiya DBP'ê ya Rezanê merasîma bîranînê li dar xist. Wêneyên jinên ku hatin qetilkirin li salonê hatin daliqandin. Merasîmê bi rêzgirtinê dest pê kir.

Hevseroka DBP'ê ya Amedê Ruken Acar di merasîma bîranînê de axivî û got ku bi pêşengiya wan têkoşîn li çar aliyan belav bû û wiha got: "Jinên kurd bûn berdewamkarên têkoşînê. Ew ê di têkoşîna me de bijîn. Em wekî jin li hemberî wan xwe her tim deyndar hîs bikin."

Hevseroka DBP'ê ya Rezan Arzu Karaman li ser têkoşînan jinên kurd û wiha axivî: "Îro Sakîne Cansiz û jinên siyasetmedar ên din hatin qetilkirin lê bi milyonan têkoşerên jin afirandin. Sakîne Cansiz li girtigehê feraseta dewletê derxist holê. Em ê her tim bibin şopdaren wan." AMED - DÎHABER

## 'Ew rêya me ronî dikin'

Komalên Jinên Ciwan (KJC) bi heman armancê daxuyaniyek nivîskî da. KJC'ê ragihand ku bîranîna her sê jinên şoreşger ên kurd rêya wan ronî dike. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: "Jinên ciwan li dijî vê komkujiyê, di şexsê Şehîd Ronas, Şehîd Bermal, Şehîd Bêrîvan û Şehîd Axînan de bi berxwedanê bersiv da zaliman. Di her kar, çalakî û rêxistina xwe de em ê sekna Şehîd Sara nemir bikin û bi vî rengî tev li têkoşîna şoreşê bibin. Em bi biryar in ku di salvegera 4'emîn a komkujiya Parîsê de, mîna Axîn û Ronasan hesab bipirsin. Lazim e hemû jinên ciwan ên welatparêz, demokratîk û sosyalîst ji malên xwe biherikin kolanan û hesab bipirsin. Komkujiya Parîsê sedema me ya şoreşê ye." BRUKSEL - ANF

## Çalakiyên edaletê didomin

Ji bo yek ji damezirînerên PKK'ê Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez ên di 9'ê Çileya 2013'an de li paytexta Fransa Parîsê ji aliyê MÎT'a tirk ve hatin qetilkirin, li gelek welatên Ewropayê çalakiyên şermezarkirinê pêk hatin. Di çalakiyan de dirûşmên "kujer Erdogan", "terorîst Tirkiye", "Fransa vê komkujiyê ronî bike" hatin berzkirin. Di çalakiyê de hat gotin ku kuştina kujer Omer Guney bi guman e loma dê wek gelê kurd, bi taybetî jî jinên kurd tu carî qebûl nekin ku rastî bê nixumandin û hat gotin ku heta sûcdar bên cezakirin ew ê daxwaza xwe ya edaletê bidomînin. ANF

## Sê jinên şoreşger nehatin jibîrkirin

Nûnertiya HDP'ê ya Hewlêrê bi semînerekê Sara, Rojbîn û Ronahî bibîr anî. Hevseroka Nûnertiya HDP'ê ya Hewlêrê Şilan Emînoglu di semînerê de qala têkoşîn û jiyana Sakîne Cansiz (Sara) kir û anî ziman ku Cansiz pêşengî ji têkoşîna azadiya jinan re kiriye û wiha got: "Mîna ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jî got, 'Kuştina Sara komkujiya duyemîn a Dersîmê ye'. Çawa ku van her sê jinên şoreşger ên leheng serî netewandin, em ê jî serî netewînin." Piştî axaftinan, belgesela "Jiyana min her tim şer bû" ya li ser jiyan û têkoşîna Sakîne Cansiz hat nîşandan. Semîner bi qêrîna dirûşmeyan bi dawî bû. HEWLÊR

## Têkiliya hemû îstîxbaratan heye

Di ser komkujiya 3 jinên siyasetmedar ên kurd re 4 sal derbas bûn. Lê heta niha têkildarî doza 3 jinên kurd tu gav nehatin avêtin. Hevseroka ÎHD'ê Eren Keskîn, têkildarî komkujiya Parîsê de axivî û diyar kir ku pêvajoya lêpirsînê hem di aliyê hiqûqî û hem jî di aliyê exlaqî de nayê qebûlkirin û wiha got: "Îhmala daraza Fransayê gelekî zêde ye. Ji ber ku ev doz ji bo pirsgirêka kurd di nava aştiyê de çareser bibe, gelekî girîng e. Divê teqez Fransa vê bûyerê ronî bike. Ez bawer dikim ku hemû rêxistinên îstîxbaratê di nava vê bûyerê de ne û têkiliya wan bi vê komkujiyê re jî heye." STENBOL

www.arsivakurdi.org

## Li Şirnexê 2 leşkerên tirk hatin kuştin



Li gorî daxuyaniya artêşa tirk, di navbera leşkerên tirk ên li çiyayê Gabarê yê Şirnexê derketin operasyonê û gerîla de şer derket. Di vî şerî de 2 leşker hatin kuştin, 5 leşker jî birîndar bûn.

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê têkîldarî êrîşên hewayî yên ku artêşa tirk li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê pêk anîne, agahî dan. HPG'ê da xuyakirin ku balafirên şer ên tirk, quntarên girê Cigerxwîn, gundên Bokrîskan, Zergelê, Dûava û qadên Karoxê yên girêdayî herêma Qendîlê ya Herêmên Parastinê yên Medyayê bombebaran kiriye.

Di daxuyaniyê de ev agahî hatin parvekirin: "Di van bombebaranan de rezên li bejahiyan û dora gundan zirar dîtine. Nûçeyên ku ji hêla medyaya şerê taybet ve tê serwîskirin û dibêje gelek cih hatine rûxandin, nûçeyên derew in, rastiyan nîşan nadin." BEHDÎNAN - ANF

# 32 roj in di greva birçûnê de ye

**H.Î. (17) yê li Girtîgeha Zarokan a Şakranê tê ragirtin, ji bo ku cezayê hucreyê û pêkanînên li girtîgehê protesto bike ji 9'ê kanûna 2016'an ve di gireva birçîbûnê de ye**

H.Î. (17) yê li Girtîgeha Zarok û Ciwanan a Şakranê tê ragirtin, ji bo cezayê hucreyê yê lê tên birîn û pêkanînên li girtîgehê protesto bike ji 9'ê kanûna 2016'an ve di greva birçîbûnê de ye. Di 2'yê Îlona 2016'an de li Stenbolê dema di lîstika şanoyê de kuştina dozgerekî dilîstin, tevî hemû hevalên xwe yên komê hatin binçavkirin. Di heman şevê de îfadeya kesên ku hatin binçavkirin, hat wergirtin û serbest hatin berdan, lê ji wan zarokan tenê H.Î. hat girtin û şandin Girtîgeha Maltepeyê.

H.Î. yê li Girtîgeha Maltepeyê rastî îşkenceyên giran hat, xistin hucreyeke yekkesî. H.Î. yê ev pêkanîn protesto kirin, di 9'ê kanûna 2016'an de dest bi greva birçîbûnê kir. Di 29'ê kanûna 2016'an de bêyî agahiya malbata wî, bi awayekî bi lez û bez H.Î. birin Girtîgeha Zarok û Ciwanan a Şakranê ya Alîagaya Îzmîrê. H.Î. ku li vir îşkence qebûl nekir, hat îşkencekirin, kincên li ser wî hatin qetandin û ew xistin hucreyeke yekkesî. H.Î. yê di greva birçîbûnê de ye û daxwazên xwe ji rêveberiya girtîgehê re ragihandin, hat diyarkirin ku daxwazên wî nehatine qebûlkirin û bi awayekî sîstematîk rastî lêdanê tê.




Parêzer Dînçer Çalim diyar kir ku muwekîlê wî ev 32 roj e di greva birçîbûnê de ye û anî ziman ku tenduristiya wî ne baş e û her ku diçe kîloyan dide. Çalim got ku wan gelek caran serî li dadgehên têkildar, Wezareta Dadê, Walîtiya Îzmîrê û Komîsyona Mafên Mirovan a TBMM'ê daye û anî ziman ku hemû serlêdanên wan bê encam mane. *ÎZMÎR - DÎHABER*

## Samî Elvan: Hêviya min ji dozê tune ye

Berkîn Elvan ê ku di dema çalakiyên Parka Geziyê de kapsula gazê li serê wî ket û li nexweşxaneyê piştî 269 rojan jiyana xwe ji dest da, 3 roj berê rojbûna wî bû. Heke Berkîn sax bûya, dê niha 18 salî bûya. Malbata wî piştî rojbûna kurê xwe bi rojekê, hîn bû ku dê polîsê bi navê F.D. ê Berkîn kuşt, bi tewanbariya "kuştina qesdî" di 6'ê nîsanê de derkeve pêşberî dadgehê.

Bavê Berkîn Elvan, Samî Elvan têkildarî îdianameya Berkîn Elvan a 3 sal şûnde hat amadekirin, diyar kir ku hêviya wan ji dozê tune ye û wiha got: "Em dibînin ku ji bo derdorên muxalîf edalet nayê meşandin. Heke xwedî li Ceylan Onkol û Ugur Kaymaz bihata derketin, kiryar bihatana darizandin, dê îro kurê min sax bûya." Elvan diyar dike ku mirinên li bajarên kurdan xwe didin der, ji ber nebertekdayîna gelê Tirkiyeyê ye. *STENBOL - DÎHABER*



## Li ser xwînê avahiyan çênekin



Malbata Rozerîn Çukur, ji ber ku cerdevanî qebûl nekir, neçar mabû koçî Sûrê bike. Rozerîna 17 salî, li kolanên lê ji dayik bû, tev li karwanê nemiran bû. Komek ji ciwanan, tevî nebûna derfetan, di 15'ê tebaxa 2015'an de xwerêveberî ragihand û piştî "qedexeya derketina derve" ya di 28'ê mijdarê de hat ragihandin dest bi berxwedanê kir. Yek ji berxwedêrên vê berxwedana 104 rojan Rozerîn bû. Rozerîn tevî gelek heval û rêhevalên xwe yên li taxê, cih û warê xwe neterikand û di roja 38'an a berxwedanê de, di 8'ê çileyê de li nêzî Dibistana Seretayî ya Suleyman Nazîf a li taxa Fatîhpaşayê jiyana xwe ji dest da. Lê belê zilma dewletê bi vê yekê neqediya. Bi hezaran leşker û polîsên tîmên taybet, tevî teknolojî û çekên xwe yên herî pêşketî, dor li cenaze girt û nehişt cenaze bê rakirin. Malbata wê û malbatên rêhevalên wê, ji bo ku cenazeyên xwe rakin, dest bi çalakiyê kir. Malbat ketin greva birçîbûnê û ji bo dengê xwe bidin bihîstin qet neçûn mala xwe û nobed girtin. 5 meh piştî bidawîbûna êrîşan, cenazeyê Rozerîn ji cihê kul ê hatibû definkirin, hat birin. Cenaze li gundê Herîdan ê navçeya Pîranê, berî pênc mehan bi kincên bûkan û ala PKK'ê ya li darbesta wê hate pêçandin, hat veşartin. Makîneya wê ya wêneyan dikişîne, ku pê wêneyên kolanên Sûrê dikişandin, danîn ber serê wê.

**ŞERM NEKIR**

Dayik Fahriye Çukur ku hê jî êşa wê nû ye, ji roja veşartina cenaze û vir ve nekarî biçe ser gorê û wiha got: "Niha li Sûrê dest bi çêkirina avahiyan dikin. Kîjan wijdan dikare vê qebûl bike. Her avahiya tê çêkirin li ser xwîna zarokên me tê çêkirin. Ez naxwazim, nabe ku li ser xwîna zarokên me avahiyan çêkin. Canê me dişewite. Dema Rozerîn kuştin, gelo li emrê wê pirsîn? Ew hîn zarok bû. Fîşek jî şerm dike li bedena wê bikeve. Lê dewletê şerm nekir dema ew kuşt." *AMED - ANF*

## Ronahî û bihar nêzîk e

Nêrîna Bêsînor
**Mizgîn Ronak**

Piştî demeke gelekî dirêj dîsa merheba! Di sala nû de bi berxwedaneke dijwartir merheba! Çavên me yên bi fikar li çar alî mêze dikin, wekî kulîlkên berfê yên xwekuj krîstalên spî dişikînin, di pirsên ku bi trênan ketine ser rê de. Gelo dê bêbextiya faşîzma tirk, fars û Beasê çawa, careke din jî bê birad bê hiştin? Bi şev û roj behs dikin: "Li Sûriyeyê agribest, aştî, aramî…" Lê behsa yên ku mîmarên vê yekê ne, nayê kirin. Yanî xwînrij û xwînmij dîsa dixwazin jiyanwer û jiyanhezan ji derveyî her tiştî bihêlin û bi ser de jî wan bikujin, tune bikin. Herçî berdevkên faşîstan tevî ku dizanin YPG, YPJ, QSD ji derveyî rista terorîzmê ya navneteweyî ne jî dixwazin êrîşên xwe bidomînin. Lê hêzên QSD'ê ber bi Reqqayê ve wekî pêlên robarekî dîn diherikin. Na! Dê vê carê lehengiya kurdan, bê hêz û peymanên siyasî û dîplomatîk nemîne, divê nemîne. Dê bihara ku niha di bin xendek û aşîtên berfê de veşartiye, berê were dilê me, paşê welatê me rengîn bike. Dê vê zivistana ku wekî kabûsa faşîzma reş dixuye û bi pencên xwe yên hesin dil û jiyana me dihincirîne wisa biqede ku em tu car nekarin bawer bikin ku ev rojên reş û talanker, di heyama me de pêk hatin.

Van rojan pirtûka Sartre ya bi navê "Hilweşîn" dixwînim. Behsa pêvajoya 'ketina Fransayê' dike. Fransaya serfiraz û hêzdar ku tenê 20 sal berê tevî êrîşên almanan bi bin xistine, vê carê tê teslîmkirin û artêşa wan a leheng a ku bist hezar leşkerên wê hene, tarûmar dibe, rût û tût li holê dimîne; li benda naziyan in ku bên wan bigirin. Ji pezên qurbanê jî wêdetir in. Lewre Fransa hatiye teslîmkirin, ketiye erdê, belam a herî giring ev e ku hêvî û bawerî şikestiye, hatiye radestkirin, ketiye bin palet û postalên naziyan. Yanî dema ku hêvî bişikê artêşeke ew qas navdar ku bi şoreşa Napolyon, alem hînî şerê nûjen kiriye jî têk diçe, welatekî wekî Fransayê kevnar û şareza jî…

Nivîskar gelek baş behsa bêhêvîtî, xwexapandin û valahiyên di ruh de ku çawa xwe bi wate û bawerîyên sexte tijî dikin, dike. Her wiha rastî hesteke ku em dibêjin qey tenê em dijîn jî hatim. Mînak; spanyolên ku berxwedana wan ji ber kêmkurtiyên navxweyî û bêhawariyê li hemberî faşîzma Franco ya ku dê 35 sal bidome têk diçe, bi 'ketina Fransayê' kêfxweş dibin, dibêjin "Hûn jî bibînin ku faşîzm çi ye lew hûn nehatibûn hewara me." Diyar dibe ku derûniya civak û gelan jî çawa wekî ya kesan e; xwedî şikestin, xeyd, bendewarî û hêvîdariyê ye. Belam çawa ku kesayetên dijwar û xwedî karakter dikarin ji bin her tewre barî derkevin û di her kavilê de wekî guleke azad bilind bibin, civak-gel jî wisa ne. Jixwe em kurd nîşaneyeke gewre ne di vê rewşê de. Ji ber vê yekê, dema niha li kuliyên berfê yên ku bi straneke sermest xwe bera jêr didin û sergêjiyeke wekî ya zarokatiyê xweş bi mirov re çêdikin mêze dikim, dizanim ku dê mayîndebûna serfiraziya Rojava Federasyona Komara Sûriyeya Demokratîk, li Bakurê welat jî xeyala tevî şehîdan bibe rastiyek.

Çawa ku bihar bi tu hêzê nayê sekinandin dê azadiya me jî neyê sekinandin. Çawa ku zilmatên herî tarî, elend û şefeqên herî ronî bi xwe re tînin dê dawiya van rojên bi 'qeyûm' û meyûman jî balahiyeke ronîdar, dilrehet û serwext be. Dê îsal a berfîn, nêrgiz û gogerçînên dilê me be! Em her sê lehengên xwe, Sakîne, Fîdan û Leylayê jî bîr nakin!

www.arsivakurdi.org

## Bavê demokrasiyê koça dawî kir



**SEROKÊ DÎROKÎ** yê sosyalîst ê Portekîzê Marîo Soares ê ku wekî "Bavê demokrasiya modern" dihat nasîn û demeke dirêj di zanîngehan de waneyên demokrasiyê dan, jiyana xwe ji dest da. Soares ji ber ku di navbera salên 1933-1974'an de li dijî rejîma Salazar (Estado Novo) tekoşînê dimeşîne, mişextî Fransayê tê kirin. Soares bi hevalên xwe re di 1973'yan de Partiya Sosyalîst a Portekîzê ava dike û bi hilweşîna dîktatoriyê ya bi Şoreşa Qurnefîlan re di 1974'an de dibe Wezîrê Karên Derve yê Portekîzê. Di navbera salên 1976-1986'an de jî serokwezîrtî û di navbera salên 1986-1996'an de jî serokomariya Portekîzê dike. Soaresê ku di dema derbasbûna demokrasiyê de roleke girîng lîst, di 92 saliya xwe de jiyana xwe ji dest da. **LÎZBON**

# Dora tawîzan piştî Rûsyayê hat Iraqê

**Tirkiye çerxkirina xwe ya polîtîkaya derve berdewam dike. Tirkiye piştî Rûsyayê di polîtîkaya xwe ya li dijî Iraqê de jî ji bo astengkirina pêşketinên kurdan çerx kir û gelek tawîz dan Iraqê û leşkerên xwe ji Başîkayê vedikişîne**

Tirkiye piştî ku bi gelek tawîzan qeyrana siyasî û leşkerî ya bi Rûsyayê re bi dawî kir û ji Rûsyayê lêborîn xwest, bi gelek tawîzan qeyrana siyasî û leşkerî ya di navbera xwe û Iraqê de jî bi dawî kir. Serokwezîrê Tirkiyeyê Bînalî Yildirim beriya du rojan bi pênc wezîrên xwe re serdana Bexdayê kir û bi serokwezîr û serokomarê Iraqê Haydar Ebadî û Fûad Mahsûm re hevdîtin pêk anîn.

Piştî du rojan detayên van hevdîtinan hatin aşkerakirin û hat dîtin ku Tirkiyeyê li gel gefên serokomarê Tirkiyeyê Recep Tayîp Erdogan ên dema destpêka operasyona rizgarkirina Mûsilê yên li dijî Iraqê jî gelek tawîz dane Iraqê. Derket holê ku Tirkiye ji bo astengiyên li dijî operasyona derveyî sînor a ku dixwaze di mehên biharê de li dijî PKK'ê pêk bîne, ji holê rake, gelek tawîz dane Iraqê.


Ji bo vê yekê Tirkiyeyê soz daye Iraqê ku dagirkeriya xwe li ser baregeha leşkerî ya Başîkayê bi dawî bike û leşkerên xwe yên li baregehê vekişîne. Tawîzeke balkêş jî nêzîkbûna Tirkiyeyê ya der barê operasyona rizgarkirina Mûsilê de ye. Tirkiye di vê mijarê de jî soz daye ku ew ê rêzê ji bo pêşketina artêşa Iraqê ya li Mûsilê bigire. *AMED*



### Xalên lihevkirina hevdîtinan

**HIN MIJARÊN** ku Tirkiye û Iraqê li hev kiriye wiha ne:

- ✓ Her du alî di çarçoveya hevpeymaniya navneteweyî de li dijî DAIŞ'ê dê danûstandinan bikin.
- ✓ Iraq û Tirkiye ji bo avakirina herêmên ji ber şer wêran bûne, dê alîkariya hev bikin.
- ✓ Her du alî dê rê nedin rêxistinên terorîst û li hemberî aliyên metirsîdar rawestin.
- ✓ Her du alî têkiliyên xwe yên aborî û bazirganî dê bi pêş bixin û zêdetir bikin.
- ✓ Her du alî dê hewl bidin pirsgirêkên mezhebî û neteweyî nehêlin.
- ✓ Her du alî dê rêzê li serweriya xaka hev bigirin.
- ✓ Tirkiye piştgiriya yekparebûna xaka Iraqê dike.



## Îmhakirina mayînan hêsantir dibe

Ji bo rakirina mayînan ji aliyê zanyar û xwendekarên alman û swîsreyî ve rêbazeke hêsantir û ewletir tê afirandin. Li gorî vê rêbazê dê mayîn ji aliyê balafirên bêmirov ve bên tespîtkirin û îmhakirin. Balafirên bêmirov di çarçoveya projeya bi navê FindMine de bên amadekirin û li ser qadên mayînkirî bifirin û ji rêbazên heyî qat bi qat xurttir li qadeke berfirehtir li mayînan bigerin.

Balafirên bêmirov dê bi rengekî otomatîk û bi 1,5 metre bilindahiyê bê kontrolkirin û ji bilindahiya 20 santîmetreyî pêlên elektromanyetîk bişîne ji mayinan re. Bi saya vê yekê dê ji jorê ve wêneyên bikalîte werin kişandin û di van wêneyan de jî dê mayîn rengîn werin dîtin.

Balafirên bêmirov ên di çarçoveya vê projeyê de bên amadekirin dê bi taybet li welatên Rojhilata Navîn û Afganistanê bên bikaranîn. Dibe ku li welatên Bosna û Kamboçyayê jî werin ceribandin. *ANF*

## Taxên Mûsilê tên rizgarkirin

Qonaxa duyemîn a operasyona rizgarkirina Mûsilê li navenda bajar berdewam dike. Fermandariya Operasyona Nînowayê Rûkin Ebdulemîr Reşîd Yarella der barê operasyonê de daxuyaniyek da û ragihand ku artêşa Iraqê 6 taxên Mûsilê rizgar kirine û 270 çeteyên DAIŞ'ê kuştine.

Yarella da zanîn ku hêzên wan ji milê çepê yê baskê başûrê Mûsilê ve bi pêş ve diçin û dest danîne ser 2 nexweşxaneyên bi navên Selam û Şîfa. Yallera bi lêv kir ku hêzên wan beşeke taxên Filîstîn û Domîz jî xistine bin kontrola xwe û 146 çete kuştine.



Li aliyê din fermandarê Hêzên Altunî yê Dijterorê yê Iraqê Fazil Berwarî ragihand ku ji destpêka operasyona rizgarkirina Mûsilê heta niha 2 hezar û 300 çeteyên DAIŞ'ê hatine kuştin. Berwarî da zanîn ku pêşveçûna hêzên wan a ber bi navçeyên Mûsilê ve jî berdewam dike.

Her wiha li paytexta Iraq Bexdayê jî teqînek pêk hat. Hat ragihandin ku teqîn bi wesayîteke bombebarkirî pêk hatiye û di encama têqînê de 12 kesan jiyana xwe ji dest da û 50 kes jî birîndar bûn. *MÛSIL*

## Li Ewropayê mirov qefilîn

Li Rûsya û welatên Yekitiya Ewropayê (YE) sermaya herî dijwar a sed salên dawîn pêk tê. Li Rûsya û Ewropayê ji ber sermaya zêde 23 kes qefilîn û jiyana xwe ji dest da. Li Rûsyayê gelek bajarên mezin jî di nav de asta germê bi qasî 30 pileyî daketiye binê sifirê. Ji ber sermaya zêde heftaya Noelê ya herî sar a 120 salên dawî li Rûsyayê pêk tê. Li bajarê Saînt Petersbûrgê yê Rûsyayê kesek ji ber sermaya zêde qefilî û jiyana xwe ji dest da.

Li welatên Ewropayê yên wekî Polonya, Îtalya, Almanya, Çekya, Bulgaristan, Swîsre û Fransayê asta germê di navbara 14 û 30 pileyî de daket û 22 kes ji ber sermaya zêde qefilîn û jiyana xwe ji dest da. Li Polonyayê 10, li Îtalyayê 7, li Çekyayê 3 û li Bulgaristanê jî 2 kes qefilîn û jiyana xwe ji dest da. Hat ragihandin ku li Bulgaristanê kesên ku jiyana xwe ji dest daye 2 penaberên iraqî ne. *ANF*

## Têkoşîna li dijî qirêjiyê!

**Komara Gel a Çînê li dijî hewaya qirêjî dest bi têkoşîneke nû dike. Rêvebirên çînî yên ku li paytext Pekînê li hev civiyan, biryar da ku bi armanca ku pêşiya hewaya qirêjî bigirin, 300 hezar wesayîtên kevn ji trafîkê red bikin. Her wiha li gelek deveran jî komir tê qedexekirin. PEKÎN**

## Serhildana leşkeran bi dawî bû

**Li Peravên Fildîşî leşkerên ku bi daxwaza şertên wan ên jiyanê bên duristkirin û zem bê mûçeyên wan serî hilda û bajarê Bouakeyê dagir kir, piştî ku daxwazên wan ji aliyê hikumetê ve hatin bersivandin, serhildana xwe bi dawî kir û vekişiyan baregehên xwe. Her wiha wezîrê desteserkirî jî hat berdan. YAMOUSSOUKRO**

## Amerîkayê leşker şand Afganistanê

Piştî ku li bajarê Helmandê yê Afganistanê êrişên Talîbanê zêde bûn, Amerîka 300 leşkerên amerîkî şandin Afganistanê. Fermandariya Navendî ya Amerîkayê der barê şandin leşkeran de daxuyaniyek da û ragihand ku bi armanca li dijî êrîşên Talîbanê piştgiriyê bidin yekîneyên leşkerî, 300 leşkerên amerîkî şandine Afganistanê.

Fermandariyê da zanîn ku leşkerên çûne Afganistanê dê alîkariyê bidin leşkerên afgan û wan perwerde bikin. Amerîka di 2004'an de yekîneyên xwe yên şer ji Afganistanê vekişandin. Li Afganistanê 8 hezar û 400 leşkerên NATO'yê hene û li dijî Talîbanê alîkariya artêşê dikin. *WASHINGTON*



www.arsivakurd.org

## Federalî serkeftina hemû gelan e

TEV-DEM'ê bi armanca nirxandina sîstema federaliya demokratîk, bi welatiyên gundê Til Merûf ê Tirbespiyê re civînek li dar xist. Di civînê de Endamê Rêveber ê TEV-DEM'ê Bawermend Reşo bal kişand ser detkeftiyên bakurê Sûriyeyê û ev nirxandin kir: "Di aloziya herêmê de gelên me bi hev re sîstema xwe ava dikin. Federaliya demokratîk, ji bo hemû gelan serkeftin e û mîsogeriya mafên hemû gelan e." Civîn bi bersivandina pirsan bi dawî bû. TIRBESPIYÊ



## Sîstema me mafê gelan mîsoger dike

Bi armanca nirxandina geşedanên dawî yên li herêmê, endamên TEV-DEM'ê bi welatiyên Til Koçerê re civînek li dar xist. Di civînê de federaliya demokratîk jî bi gel re hat şîrovekirin. Endama Rêveber a TEV-DEM'ê Roza Mihemed got ku bi federaliya demokratîk hemû gel dikarin xwe temsîl bikin. Roza Mihemed da zanîn ku di aloziya herêmê de wan sîstema ku mafê hemû gelan mîsoger dike, pêş xistine. Di dawiyê de pirsên gel hatin bersivandin. GIRKÊ LEGÊ



## Rêxistinên mirovî niha li ku ne?

Welatiyên taxên rojhilatê Helebê dan zanîn ku her ku diçe xetereya li ser jiyana wan zêdetir dibe û tevlî vê yekê jî heta niha tu rêxistinên mafên mirovan bi wan re nebûne alîkar. Welatiyan gotin ku jiyana wan gelek zehmet bûye û dan zanîn ku demildest pêwîstiya wan bi amûrên jiyanî hene. Welatiyan bang li raya giştî kir ku demildest alîkariya jiyanî bidin wan. Endamên meclisên taxan jî bang li rêxistinên mirovî kirin ku zûtirin dem de alîkariyê bişînin Helebê. HELEB



## Serçeteyê Cebhet El Şamê hat kuştin

Li gorî agahiyên ji çavkaniyên Idlibê hatine wergirtin, serçeteyekî Cebhet Fetih El Şamê yê bi navê Ebû Yûsif El Ensarî hatiye kuştin. Çavkaniyên ji herêmê dan zanîn ku serçete Yûsif El Ensarî yek jê berpirsyarê alavên leşkerî yên eniya gundewarên Idlibê bû û gelek wesayîtên bombebarkirî ji hêla vî çeteyî ve dihatin amadekirin. Çavkaniyan ragihandin ku serçete El Ensarî di roja înê de di encama teqandina bombeya ku bi wesayîta wî ve hatibû barkirin, hatiye kuştin. EFRÎN



# Şervanan fermana çeteyan anî

**Êrîşên komên çete yên DAIŞ'ê yên li dijî gundên Til Semen û Silis Xinezê hatin şikandin. Di encama pevçûnan de 25 çete hatin kuştin û tevî 2 tang û panzeran gelek wesayît jî hatin rûxandin**

Şervanên Xezeba Firatê êrîşên komên çete yên DAIŞ'ê yên li dijî bajaroka Til Semen û gundê Silis Xinezê bi temamî şikandin. Di encama pevçûnan de 25 çete hatin kuştin û 2 tang jî hatin rûxandin.

Komên çete yên DAIŞ'ê di 7'ê çileyê de ji du aliyan ve bi çekên giran û hejamareke zêde êrîşî bajaroka Til Semen û gundê Silis Xinezê kirin. Li ser bersivdayîna şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê li herêmê pevçûnên dijwar qewimîn. Di encama pevçûnan de êrîşa çeteyan hat şikandin û bi qasî hatiye zelalkirin 25 çete jî hatin kuştin. Hat zanîn ku 16 cenazeyên çeteyan jî di destê şervanan de ne.

**WESAYÎT RÛXANDIN**

Li gorî agahiyan di pevçûnan de 2 tang, 3 wesayîtên bomebarkirî, 2 wesayîtên leşkerî û motorsîklêtekî bombebarkirî hatin rûxandin. Şervanan di pevçûnan de dest danî ser 11 keleş, 2 BKS û 2 zincîrên wê, B7'ek û 4 rokêtên wê, berçavkek, 16 rextên teqemeniyê û 2 bataryayan. *REQQA - ANHA*



## Mizgîniya rizgariyê dan gel

**ŞERVANÊN ODEYA** Çalakiyan a Xezeba Firatê li gundê Siwêdiyê Rojhilat gelek çek û cebilxaneyên çeteyên DAIŞ'ê bi dest xistin. Di encama xebatên lêgerînê yên li gund de şervanan dest danî ser 2 BKC, 2 RPC, 2 rext û 5 narîncokan. Di heman demê de 32 çete jî hatibûn kuştin.

Gundê Siwêdiya Rojhilat 4 km'yan dûrî gundê Caber Rojhilat e. Li Siwêdiyayê sê girên stratejîk ku çeteyan wek baregehên leşkerî bi kar dianîn, hene. Der barê mijarê de şervanan anî ziman ku çeteyên DAIŞ'ê li tu eniyan nikarin xwe li ber pêşveçûna hêzên wan bigirin. Şervanan her wiha mizgîniya rizgarkirina gundên din da welatiyên herêmê. Şervan ber bi gundê Siwêdiya Mezin ve diçin. REQQA - ANHA

## Erka xwe ya mirovî pêk anîn



**WELATIYEN** gundê Caber Rojhilat û Rojava ji ber şer û pevçûnan li derdora gundên xwe di konan de diman. Piştî ku şervanan gundên wan rizgar kirin, careke din vegeriyan gundên xwe. Welatiyan banga paqijkirina mayînan li şervanan kir. Der barê mijarê de welatiyê bi navê Abdullah Mûsa El Şêx diyar kir ku morala wan bilind e û serkeftin ji şervanan re xwest. Welatiyê bi navê Wetha Hisên jî destnîşan kir ku piştî ku şervanan gundê wan rizgar kir dilê wan rehet bûye û wiha got: "Em dixwazin zûtirîn dem vegerin gundê xwe."Şêniyê bi navê Alî Omer jî spasiya şervanan kir û got ku şervanan erka xwe ya mirovî pêk anî û ew rizgar kirin. REQQA - ANHA

# Tekane rê çareseriya siyasî ye

CÎHAD ROJ / QAMIŞLO - ANHA

Çalakvanê siyasî yê sûriyeyî Alî Seed destnîşan kir ku divê kurd tev li civîna Astanayê bibin û da zanîn ku ji bo çareseriyeke siyasî li Sûriyeyê, dengê gelê kurd pir girîng e.

Çalakvanê siyasî û Endamê Desteya Koordînasyona Niştîmanî Alî Seed diyar kir ku wan wek deste gelek caran aniye ziman ku aloziya Sûriyeyê bi rêyên leşkerî çareser nabe û wiha domand: "Çareseriya siyasî bi rêya guhertineke demokratîk, bi kok û ber bi avakirina Sûriyeya pêşerojê ve diçe. Em dixwazin nûnertiya hemû gelên Sûriyeyê bikin. Kurd pêkhateyeke



bingehîn ji civaka Sûriyeyê ne. Ji bo çareseriyeke siyasî tevlibûna gelê kurd di civîna Astanayê de gelekî girîng e."

Alî Seed destnîşan kir ku heta hemû pêkhateyên Sûriyeyê tev li civînê nebin, ne mimkûn e ku tu civîn bigihîjin armancên xwe û wiha pê de çû: "Em, di vê mijarê de kedeke mezin didin. Ji bo çareseriyê agirbest gaveke baş e lê li pêşiya hêzên sûd ji şerê Sûriyeyê dibînin re dibe astengî. Meclisa Damezirîner a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê di gelek aliyan de bi ser ket. Ev serkeftina wan ji aloziya Sûriyeyê herêmî û navneteweyî çareser bibe, dê bibe alîkar."

Di dawiyê de jî Seed ev tişt anîn ziman: "Ez bang li hemû gelên Sûriyeyê dikim ku li hemberî desthilatdarî û terorê bisekinin û yekitiya xwe ava bikin. Tekane rêya çareseriyê, çareseriya siyasî ye."

## Mirin ji terikandina axê baştir e

ŞÎLAN MIHEMED / MINBIC - ANHA

Kalê Mistefa ji ber êrîşên balafirên şer ên artêşa tirk a li ji Babê koçberî herêma Minbicê dibe. Kalê Mustafa vê êşa xwe wiha tîne ziman: "Mirin ji terikandina axa mirov xweştir e."

Di encama êrîş û dagirkeriya artêşa tirk a li herêma Şehbayê de bi hezaran malbat koçber bûn. Yek ji van malbatan jî malbata Mustefa Receb e. Malbatê da zanîn ku hefteyek berê di encama bombebarana artêşa tirk de hewl dan ku li herêma El Seken El Şebabî birevin lê dikevin nava mayînan û mayînek bi bavê wan Mustefa ve diteqe.

Malbatê da zanîn ku piştî ku mayîn diteqe komên çete jî wan gulebaran dikin û ev tişt vegotin: "Me nekarî ji bavê xwe re bibin alîkar. Çend deqe piştre me xwest biçin bînin. Dema em gihaştinê me dît ku dema ku nimêja xwe ya dawî dikir, bi awayekî rûniştî miriye. Piştre careke din çeteyan em gulebaran kirin û me nekarî cenazeyê xwe bibin."

Demek şûnde malbat derbasî gundê Ebû Zendîn ê Babê û ji wir jî derbasî Minbicê dibin. Malbata ku ji hêla şervanan ve hate pêşwazîkirin, niha li cihên ewle dimînin. Malbatê diyar kir ku kalê wan Mustefa Receb qebûl nedikir ku mala xwe biterikîne û ev tişt gotin: "Her tim digot; 'Mirina li ser axa min ji derketina mala min xweştir e.' Lê dema ku em ji êrîşên Tirkiyeyê direviyan hate qetilkirin."

# Kongreya YRA'yê hat lidarxistin

Kongreyeya YRA'yê di kesayeta şehîd Mustefa Mihemed de diyarî hemû şehîdên ragihandina azad ên Rojava hat kirin û bi serkeftî bi dawî bû.

Kongreya Yekitiya Ragihandina Azad (YRA) bi dirûşma 'Şopdarên rastiyê bingeha ragihandina azad in' bi tevlîbûna 200 delegeyan hat lidarxistin. Di kongreyê de rapora salane hat xwendin. Xebatên herî girîng ên YRA'yê wek xebatên hemleya 'Ji bêdengiyê re Na' û ya din jî pêşangeha 'Ji Kobanê heta Sineyê' hatin diyarkirin.

Di kongreyê de rêziknameya yekitiyê hat xwendin û hin xalên wê hatin sererastkirin. Di kongreyê de pêşniyarên belgekirina kiryarên Tirkiyeyê yên li dijî bakurê Sûriyeyê, pêşxistina xebatên li kantonên Kobanê û Efrînê û vekirina YRA'yê li bakurê Sûriyeyê hatin kirin. Her wiha kongre di kesayeta şehîd Mistefa Mihemed de diyarî hemû şehîdên ragihandina azad ên Rojava hat kirin.

Di encama hilbijartinê de jî hevserokên YRA'yê wek Ekrem Berekat û Şehnaz Osman hatin hilbijartin. Her wiha endamên Meclisa YRA'yê yên Kantona Cizîrê hatin hilbijartin û endamên kantonên Efrîn û Kobanê jî dê bi xwe nûnerên xwe diyar bikin. Ji her kantonekê 5 kes di civînê de cih digire. *QAMIŞLO - ANHA*




www.arsivakurd.org

# Qeyûm bîrdariya Roboskê hilweşand

**Bîrdariya ji bo bîranîna kesên ku di qetlîama Roboskê de hatin qetilkirin beriya 4 salan li Amedê hat danîn, bi fermana qayûm ji aliyê polîsan ve hat rakirin û mermerê ku navê 34 sivîlan lê hatibû nivîsandin jî hat parçekirin**




Bîrdariya Roboskê ya ku ji bo bîranîna 34 kesên ku di 28'ê kanûna 2011'an de li gundê Roboskê yê navçeya Qilabanê ya Şirnexê ji aliyê balafirên şer ên artêşa tirk ve hatin qetilkirin li Parka Roboskê ya semta Dîclekentê ya navçeya Peyasê ya Amedê hatibû danîn, hat rakirin. Abîdeya ku ji aliyê peykersaz Suat Yakut ve hatibû çêkirin 8 maketên fuzeyan, peykera jina ku destên xwe vekirine û navên 34 kesan hatibû nivîsandin.

Polîsên ku serê sibê hatin parka ku abîde lê heye bi makîneyên kar peyker parçe kirin. Polîsan maketên fuzeyan û peykerê dayikê ji cih rakirin û mermerên ku navên 34 sivîlan lê hebûn jî parçe kirin. Makîneyên kar ên ku anîn parkê jî zirar dan dar û kulîlkên di hundirê parkê de û bi vî rengî ketin hundir.

Têkildarî mijarê rayedarên Şaredariya Peyasê ya qeyûm lê tayînkirî diyar kir ku der barê mijarê de agahiya wan tune ye.

Piştî ku qeyûm tayînê şaredariyên DBP'î hatibûn kirin berê jî li avahiyên şaredariyan tabelayên pirzimanî hatibûn rakirin, ala tirkan hatibû daliqandin. Dîsa li ber deriyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê jî peykerên şêran ku serê wan dişibin ên mirovan û di serdema asûriyan de li cihê pîroz wek parêzvan dihatin hesibandin jî hatin rakirin.

Her wiha bi Biryarnameya di Hikmê Qanûnê de (KHK) ya ku roja borî hatibû weşandin Komeleya Roboskê jî hatibû girtin. ***AMED - DÎHABER***

## Me serî netewand em ê netewînin jî

SEDAT SÛR / MÊRDÎN – ANF

Di operasyonên desthilatdariya AKP û MHP'ê de bi hezaran kurd li Kurdistanê hatin girtin. Yek ji bajarên ku herî zêde operasyonên qirkirina siyasî lê tên meşandin Mêrdîn e. Li Mêrdînê heta niha bi sedan kes hatine girtin û binçavkirin.

Di operasyonên qirkirina siyasî yên salên 2009 û 2011'an de, hevserokê HDP'ê yê Mêrdînê Alî Aslan û Abdulkadîr Çorgatay bi îdiaya "endamên KCK'ê ne" hatibûn girtin. Aslan û Çorgatay li ser mijara operasyonên siyasî yên ji nû ve zêde bûne, axivîn.

Hevserokê HDP'ê yê Mêrdînê Alî Aslan da xuyakirin ku di sala 2011'an de di operasyonên qirkirina siyasî yên AKP û cemaeta Gulen de hat girtin û 4 salan girtî ma. Aslan destnîşan kir ku di wê demê de armanc ji girtinan çi bû, niha jî armanc ew e.

Aslan diyar kir di roja me ya îro de rejîma AKP û MHP'ê pêwîstî bi hiqûqê nabînin û hema yekser êrîş dike û mirovan digire. Aslan anî ziman ku faşîzma AKP'ê êdî tu sînoran nas nake û da zanîn ku berê dema girtin û binçavkirinan de mafên parastinê hebûye û wiha got: "Lê belê niha nediyar e mirov çend rojan di binê çavan de bimîne, parêzer nîne, mafê parastinê nîne, hevdîtina bi malbatê re nîne. Yanî AKP û Erdogan hiqûqê nas nake." Aslan got ku çawa AKP'ê di operasyona dema borî de tu encam bi dest nexistiye dê niha jî bi dest nexe û ev tişt anî ziman: "Me wê demê jî serî netewand, em ê niha jî netewînin."

Rêveberê ÎHD'ê Abdulkadîr Çorgatay jî anî ziman ku ew di operasyona 2009'an de bi hevkariya AKP û Cemaatê hatiye girtin û wiha domand: "AKP'ê piştre ev hemû operasyonên ku hatibûn kirin kir stûyê cemaatê. Lê belê niha AKP'ê hîn operasyonên girantir dide meşandin. AKP berpirsyarê operasyonan e."

Çorgatay destnîşan kir ku ew li dijî her şêwe êrîşan li ber xwe didin û tu carî serî li ber faşîzma AKP û Erdogan natewînin.




## 'Hemû rojnameger Metîn in'

Rojnameger û nûçegihanê rojnameya Evrenselê Metîn Goktepe yê di 8'ê Çileya 1996'an de li Umraniye ya Stenbolê hat qetilkirin, li goristana Kemer a Esenlerê jî aliyê malbat û hevalên xwe yên rojnameger ve hat bibîranîn. Di bîranînê de Dayika Metîn Goktepe Fadime Goktepe axivî û diyar kir ku ji ber kurê wê rojnameger bû, hat kuştin û wiha got: "Metîn 22 sal berê hat qetilkirin. Ew rojnameger bû. Hermû zarok, jin, karker, kedkar û her rojnameger Metîn in."

Gerînendeyê Weşana Giştî yê rojnameya Evrenselê Fatîh Polat jî anî ziman ku Metîn Goktepe bi lêdanê hat kuştin û wiha axivî: "Rojnamegerê Cumhuriyetê Ahmet Şik jî hevalê Metîn ê herî nêzîk bû. Îro jî rojnamegerî bi lêdanê tê xwestin bê tunekirin. Midûrê Karên Nivîsan ê Rojnameya Ozgur Gundemê Înan Kizilkaya girtî ye. Lê li gel hemû zextan rojnamegerî li ber xwe dide û serî natewîne."

Seroka Giştî ya EMEP'ê Selma Gurkan jî anî ziman ku ew şertên siyasî yên ku Metîn Goktepe kuşt îro hêj didome. Gurkan anî ziman ku êrîş, zext û tundî kirine halekî rewa û got ku çi dibe bila bibe ew dê rojnamegeriyê berdewam bikin. ***STENBOL - DÎHABER***



## Em ê têkoşînê xurt bikin

Bi Biryarnameyên di Hukmê Qanûnê de yên di 6'ê meha çileyê de hatin derxistin, 16 endamên Sendîkaya Kedkarên Buroyê (BES) a Îzmîrê hatin îxrackirin. Endamên BES'ê yên hatin îxrackirin gotin ku di ser wan re dixwazin peyamekê ragihînin û destnîşan kirin ku ew ê li dijî îxrackirinan têbikoşin.

Sekretera BES'ê Maîle Ariç a bi KHK'ê re hat îxraçkirin destnîşan kir ku armanca bingehîn a KHK'yan astengkirina rêxistinbûyînê û bi awayekî fiîlî qedandina sendîkayê ye û wiha got: "Lê em ê têkoşîna xwe xurt bikin."

Çaglar Yildiz anî ziman ku sedema îxraçkirinan afirandina atmosfera tirsê ye û got ku hemû îxraçkirin bi kêfî ne.

Serokê BES'a Îzmîrê Musa Sever jî diyar kir ku ew ê îro tevî endamên xw werin gel hev û dê îxracan binirxînin.
***ÎZMÎR - DÎHABER***

## Kiliçdaroglu be jî em red dikin

Parlamentera CHP'ê ya Îzmîrê û Endama Komîsyona Lêkolînkirina Mafên Mirovan Zeynep Altiok der barê binpêkirinên mafan ên di 2016'an de û pêşnûmeya guhertina Qanûna Bingehîn a ku dê îro di Meclisê de bê nîqaşkirin de axivî.

Altiok da zanîn ku di vî pêvajoyê de ji bo ku nebêjin "Sîstema Serokdewletiyê" bi navê "Sîstema serokomariyê" guhertinekî rejîmê ya balkêş dikin û wiha got: "Vî sîstemê jî dixwazin wekî ku nebikêrhatiya xwe ya 14 salan veşirin. Serdestiyek ku ji ber kirinên xwe yên dijberê civakê neyê lêpirsînkirin em red dikin. Ger Kiliçdaroglu be jî em dîsa vî sîstemê red dikin."

Altiok balê kişand ser binpêkirina mafên mirovan ku ji aliye desthilatdariya AKP'ê ve tê kirin û ev tişt got: "Di nav 14 salan de pêvajoya binpêkirinên mafan û hem jî mexdûrkirina civakê di feraseta ku dixwaze welat tune bike de bêkontroliyek derxist holê. Bi hewldana darbeyê ve jî tabloyekî cuda derket holê. AKP'ê ferasete rêveberiyê ya ku yên jixwe nînin cuda dike qebûl kiriye. Bi OHAL'ê re mirovatî êdî li vî welatî têk çû. Niha guhertina Qanûna Bingehîn mayîndakirina OHAL'ê wêditir tiştek nîne."

Altiok anî ziman ku ji bo ev krîz bê çareserkirin pêwîstî bi pergalekî wekheviyê, azadiyê û aştiyê dipirsgirêkan azadî, wekhevî û aboriyê heye. Pirsgirêka şîdet û ewlehiya canê mirovan heye. Divê bi pergalekî wekhev hemû pirsgirêk ji holê bên rakirin."
***ENQERE DÎHABER***

## Dê Tirkiye bibe dewleta partiyê

**SEROKÊ GIŞTÎ YÊ CHP'Ê** Kemal Kiliçdaroglu li Meclisa Partiyê têkildarî pêşnûmeya guhertina Qanûna Bingehîn nirxandin kir. Kiliçdaroglu diyar kir ku ger pêşnûmeya guhertina Qanûna Bingehîn a ku AKP û MHP'ê li hev kirine bê qebûlkirin dê Tirkiye veguhere dewleta partiyê. Kiliçdaroglu anî ziman ku Tirkiyeyê ji bo demokrasiyê bedelên giran daye û wiha axivî: "Di vî mijarê de peywir dikeve ser milê me hemûyan. Di navbera ferasetа me û ya wan de qasî çiya ferq heye. Di dema Ecevît de 38 madeyên qanûna bingehîn hat guhertin. Ma pevçûn çêbû? Na. Di 2010'an de AKP'ê berovajî vê kir. Bi çanda ferzkirinê xwestin qanûna bingehîn biguherînin. Tirkiye îro bûye dewleta otorîter a îstixbaratê. Darbekarên 20'ê tîrmehê rewşa fiîlî dixwazin bikin zemîna qanûna bingehîn."

www.arsivakurdi.org

# Yildirim ji bo kuştina kurdan alîkarî ji Barzanî xwest

Serokwezîrê tirk Bînalî Yildirim li gel şandeyeke rayedarên dewleta tirk bi serokê PDK'ê Mesûd Barzanî û serokwezîrê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî re hevdîtin pêk anî. Di encama civînê de Yildirim destkeftiyên kurdan ên li çar parçeyan hedef nîşan dan.

Şandeyeke rayedarên dewleta tirk ku ji Bînalî Yildirim û 5 wezîrên din pêk dihat piştî hevdîtinên bi Bexdayê re, bi Nêçîrvan Barzanî û Mesûd Barzanî re hevdîtin pêk anî. Piştî civînê, Yildirim û Mesûd Barzanî daxuyaniyeke hevbeş da çapemeniyê. Di daxuyaniyê de Barzanî hatina Yildirim wek nîşaneya piştgiriya Tirkiyeyê nirxand û wiha dom kir: "Hêvîdar im ku Tirkiye di têkoşîna li dijî terorê de bi bandor bibe."

Bînalî Yildirim jî di axaftina xwe de destkeftiyên kurdan ên li her çar parçeyan hedef nîşan dan û ev tişt anîn ziman: "Ji bo tunekirina PKK'ê çi pêwîst be em ê bikin. Em belavbûna PKK'ê li Şengalê qebûl nakin. Divê ji bo vê gefê em bi hev re bixebitin. Em nikarin çavên xwe li xebatên PYD'ê jî bigirin. Ji bo me PYD, YPG û PKK heman in."

Yildirim di axaftinên xwe de tenê destkeftiyên gelê kurd hedef nîşan dan. Balkêş e ku di daxuyaniyê de Bînalî Yildirim got ku nêrîna wan û ya Barzanî der barê PKK, PYD û YPG'ê de heman e û van hêzan wek 'dagirker' bi nav dikin. Tevî ku Yildirim ji bo PKK'ê peyva 'teror' bi kar anî jî, Mesûd Barzanî di vê derbarê de tu îtîraz nekirin. HEWLÊR - ROJNEWS



## 'Li dijî PKK'ê li hev kirine'



Parlamenterê YNK'ê li Parlamentoya Iraqê Şiwan Dawidî da zanîn ku armanca Tirkiyeyê derxistina PKK'ê ya ji Iraqê ye û ev tişt got: "Ji bo derxistina PKK'ê, Tirkiye, Iraq û Herêma Kurdistanê amadekarî kiriye."


Şiwan Dawidî anî ziman ku lihevkirina Bexda û Enqereyê ne tenê li ser vekişîna Tirkiyeyê ji Başîkayê ye û wiha dom kir: "Armanca Tirkiyeyê derxistina PKK'ê ji Iraqê bi taybet jî ji Şengalê ye. Amadekariyên vê jî bi hikumeta navendî ya Iraqê û Herêma Kurdistanê re kirine. Li hemberî vê jî dê Tirkiye ji Başîkayê vekêşe. Lê hêj 28 baregehên leşkerî yên Tirkiyeyê li Başûr in." HEWLÊR - ROJNEWS

## 'Rojhilat dikare pêşengiya kongreya neteweyî bike'

Hevserokê Civaka Demokratîk û Azad a Rojhilatê Kurdistanê (KODAR) Fûad Bêrîtan diyar kir ku li bendêmayîna çareserkirina pirsgirêka kurd ji aliyê dagirkeran ve, tenê xwexapandin e.

Fûad Bêrîtan anî ziman ku doza kurd nêzîkî serkeftinê ye û da zanîn ku bi destkeftiyên li Başûr û Rojava gelê kurd bû xwedî statû. Bêrîtan diyar kir ku ev destkeftî bi saya xwîna şehîd û têkoşîna gelê kurd hatine bidestxistin û wiha dom kir: "Sê aliyên Rojhilata Navîn di nava şer de ne. Ya yekem nûnerên şaristaniya sermayedar û hêzên dagirker ên cîhanê wekî Ewropa û Amerîkayê, ya duyemîn dewletên netew ên herêmê wekî Îran, Tirkiye û Sûriyeyê û ya sêyem jî şaristaniya demokratîk ku gelê kurd nûnertiya wê dike."

Di berdewamê de Fûad Bêrîtan destnîşan kir ku dê ev şer hîn dirêj bibe û wiha pê de çû: "Aliyên xwedî proje û rêyên çareseriyê dê bi ser bikevin. Hêzên têkçûyî jî dê herêmê biterikînin. Ji ber ku dewletên netew nikarin pirsgirêkan çareser bikin, şansê wan ê serkeftinê jî tune ye. Divê kurd jî nekevin nava şerê etnîk û mezhebî. Bi taybet jî divê li rojhilatê Kurdistanê modeleke taybet ê çareseriyê hebe. Libendêmayîna çareserkirina pirsgirêka kurd ji aliyê dewletên din ên dagirker ve tenê xwexapandin e. Aliyê Rojhilat dikare ji bo kongreya neteweyî rola pêşengiyê bike." SILÊMANÎ - ROJNEWS



# Êzidiyan xwest PKK li Şengalê bimîne

**Koordînasyona Civaka Êzidî ya Demokratîk di encamnameya xwe de xwest ku PKK ji bo parastina gelê êzidî li Şengalê bimîne û wiha hat gotin: "PKK bû hêviya gelê me. Divê bi vê berpirsyariya xwe rabe."**

Encamnameya civîna Koordînasyona Civaka Êzidî ya Demokratîk hat weşandin. Di encamnameyê de bang li PKK'ê hat kirin ku pêwîstiya wan bi parastina wan heye û ji bo vê yekê jî divê PKK li berpirsyariya xwe rabe.

Civîna Koordînasyona Civaka Êzidî ya Demokratîk di navbera 25-28'ê kanûnê de li çiyayê Şengalê bi beşdariya 60 delegeyên ji tevahiya Kurdistanê, Ewropa, Rûsya û Ermenistanê pêk hat. Di encamnameyê de biryarên girîng hatin dayîn.

Koordînasyonê da zanîn ku ew wek civaka êzidî dixwazin êdî rastiya ku li ser wan tê ferzkirin biguherînin û wiha dom kir: "Di civînê de hat diyarkirin ku ji bo yekitiya civaka me ku li cîhanê belav bûye, xebat bê destpêkirin û ev hewldan wek platform, vîn û mekanîzmayekê bê birêxistinkirin."

**XWESERIYA ŞENGALÊ**

Têkildarî statûya Şengalê jî ev agahî hatin dayîn: "Di civîna me de siyasetek û nêzîkatiyeke dîplomasiyê ya ku mafên êzidiyan mîsoger dike û li ser perspektîfa xweseriya Şengalê esas hatiye girtin. Biryar hat dayîn ku ji bo vê li nava saziyên navneteweyî û herêmî xebat bên kirin. Em amade ne ku bi hikumeta herêmî û hikumeta navendî re jî hevdîtinan bikin."

**DÊ YBŞ'Ê XURT BIKIN**

Der barê xwebirêxistinkirina êzidiyan de jî koordînasyonê wiha got: "Feraseta xwerêveberî û sazîbûnê êdî pêwîstiyek e. Ji ber pêwîstiya birêxistinbûna hevpar a civaka me, koordînasyona me 31 kesên ji nûnerên hemû sazî û rêxistinên êzidiyan ên li çar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat pêk tê, hilbijartiye û koordînasyoneke ji pênc kesan diyar kiriye. Biryar hat dayîn ku YBŞ ji hêla îdeolojîk û rêxistinî ve were xurtkirin û hejmara wê were mezinkirin. Ji bo fermiyeta YBŞ'ê jî xebat bên kirin."

**BÛN HÊVIYA ÊZIDIYAN**

Koordînasyonê da zanîn ku hêzên navneteweyî hê siberoj û hebûna êzidiyan ewle nekirine û wiha berdewam kir: "Pêwîstiya civaka êzidî bi parastina PKK'ê heye. Em bi vê wesîleyê careke din bang li PKK'ê dikin. Hûn hatin Şengalê û bûn hêviya civaka me. Ji bo civaka me, di nava şert û mercên herî zehmet de li ber xwe dan. Hê jî berpirsyariya we li pêşberî vê civakê heye û em derketina we ji vê derê rast nabînin. Pêwîstiya vê civakê bi we heye û em bawer in hûn ê bi berpirsyariya xwe rabin." *ŞENGAL - ANF*



## Gelê êzidî aciz e

**KOORDÎNASYONÊ** destnîşan kir ku Şengal cih û warê hevpar ê hemû êzidiyan e û siberoja Şengalê siberoja tevahiya civaka êzidî ye. Koordînasyonê da zanîn ku gelê êzidî bi nîqaşên li ser Şengalê aciz e û diêşin û ev tişt parve kirin: "Yên ku rûyê wan nîn e li civaka êzidî binêrin, bi piştgiriya dijminê civaka me AKP'ê hewl didin xwe bikin xwediyê êzidiyan. Em ji bo vegera Şengalê, garantoriya saziyên navneteweyî yên mîna Neteweyên Yekbûyî (NY) û Yekitiya Ewropayê (YE) dixwazin. Di heman demê de mafê me ye ku em ji PKK'ê bixwazin ku hê jî vê civakê biparêze. PKK dema ku bi hawara me de hat, em jî di nav de ji tu kesî nepirsî û kesî jî nekarî pêşî lê bigire. PKK bi berpirsyariya xwe ya însanî û neteweyî rabû."

## Garantorî xwestin

**KOORDÎNASYONA** Civaka Êzidî ya Demokratîk bang li NY, YE û DYA'yê û saziyên navneteweyî kir ku ji bo ewlebûna mafên civaka êzidî, xweseriya Şengalê û rêvebirina xwe bi xwe ya êzidiyan bikevin nava hewldanan û bibin garantor. Koordînasyonê bang li hemû êzidiyan kir ku nêrînên wan ên siyasî çi dibe bila bibe, bila li gorî berjewendiyên civaka xwe tev bigerin û banga vegera Şengalê li gelê êzidî kir.

# 'Serdana pêşmergeyan bersiva dagirkeriya tirk e'

KCK'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku serdana pêşmergeyên ku ji bo azadiya Kurdistanê şer kirin a li Qendîlê, bersiva gelê Başûr ya li dijî dagirkeriya Tirkiyeyê ye.

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê têkildarî serdana Pêşmergeyên Dêrîn a Qendîlê destnîşan kir ku moraleke mezin daye gerîla û gelê kurd û wiha hat gotin: "Dê hest û welatparêziya mezin a wan, di têkoşîna azadiyê de bidome. Gerîla dê bi têkoşînê xwe bibe bersiva van hestan."

KCK'ê daxuyand ku hatina pêşmergeyan wekî helwesta gelê Başûr li dijî hebûna hêza leşkerî ya Tirkiyeyê li Başûr e û wiha dom kir: "Ev helwest ji bo gel û tevgera me gelekî watedar e. Hebûna leşkerên tirk li Başûr, tê wateya binpêkirina gora şehîdan. Bi vê yekê pêşmerge li xwîna şehîdan xwedî derketin."

Di daxuyaniyê de KCK'ê gotina pêşmergeyan a 'Em ê mil bi mil li gel gerîla şer bikin' bibîrxist û ev tişt parve kirin: "Ji bo me ev gotin tê wateya helwesta gelê Başûr li dijî dagirkeriya Tirkiyeyê. Vîna rast a gelê me yê Başûr jî ev e. Hatina pêşmergeyan a Qendîlê nîşaneya berxwedana sala 2008'an a gel a li Bamernê, Amediyê, Deralûk û Şeladizê ye. Hewldana dagirkiriya Başûr, piştî têkçûna Zapê dê bibe têkçûneke din a mezin."

Daxuyanî wiha bi dawî bû: "Daxwaza pêşmergeyan a ji bo pêkhatina kongreya neteweyî, ji bo me talîmat e. Divê hemû hêzên siyasî vê bangê bibînin. Helwesta pêşmergeyan a li dijî birakujiyê jî gelekî girîng e û ji bo me fermanek e. Bi van hest û baweriyan em pêşmergeyên hatine Qendîlê bi rêzdarî silav dikin û soza bicihanîna hesreta wan didin." *BEHDÎNAN - ANF*



www.sivilkurdi.org




# Xwedawenda çiyayên azad
# Sakîne Cansiz

**Heval Sara, rûken û delala çiyayên Dêrsimê û Kurdistanê. Erê fermandara hêja, zelalbûna te dê bikeve nav rûpelên dîrokê, serhildan û berxwedana te dê peyv bi peyv, kêlî bi kêlî bê nivîsandin**

## Paradîgmaya Rêber Apo fêm kiribû

DEMA NAVÊ heval Sarayê tê gotin mirov vedicinîqe. Ji ber ku kesayetiyeke ew qas bi bandor e di dîroka gelê kurd de. Li gel hezkirina mezin a heval Sara ji bo jin, zarok, gel, hezkirina wê ya ji bo xwezayê jî pir zêde bû. Girîngiyeke pir mezin dida xwezayê. Ji ber ku digot; 'ya ku mirovahiyê xweşik dike xweza bi xwe ye' ji bo wê jî Sarabûyîn ked, têkoşîn, berxwedan û cesaretê dixwaze. Loma heçî Sara dîtibe teqez jê bi bandor bûye. Paradîgmaya Rêber Apo ji xwe re esas girtibû û tiştên ku Rêber Apo digotin bi pratîka xwe pêk dianîn. Libendêmayîn, rehetî, sebr li gel heval Sara tune bû. Her deqeyeke wê bi kar û xebatê derbas dibû. Yanî nedihişt tu deqeyeke wê vala biçe. Hemû jiyana wê bi fedakarî derbas dibû. Di aliyê rêhevaltiyê de jî hevaleke gelekî hişyar bû. Hevala Sara jî di vî alî de hem pir hesas û hem jî hişyar bû. Ji pirtûka wê ya 'Jiyana Min Her Tim Şer Bû' jî baştir xuya dike ku xwedî hevaltiyeke çi qas mezin e.



## Tovê ku hatiye çandin li her derê şîn dibe

**HEVAL SARA** yek ji tişta ku pir nirx didayê jî perwerde bû. Ji ber ku di nava tevgera azadiya kurd û tevgera jinan de yek ji xala herî girîng û jêneveger perwerde ye. Di nava rêxistinê de çeka herî mezin perwerde ye. Di nava PKK'ê de kesayetiya perwerdekirî xala sereke ye. Ji ber ku kesayetiya azad û zana dikare pêşengiya şoreşan bike. Kesayetiya ku xwe perwerde neke nikare bi pêş jî bikeve. Perwerde pirî caran ji çekê xurttir e. Loma heval Sara jî di vî alî de pir hesas bû û girîngiyeke mezin dida ku her kes bixwîne, binivîse û pê bizane. Nemaze jî dixwest her jinek perwerdeyê bibîne û xwedî gotin be. Jin baweriya xwe bi xwe bînin, bi biryar bin û pêşengiyê ji şoreşê re bikin. Xeyalên heval Sara di roja me ya îro de hemû yek bi yek pêk tên. Di roja me ya îro de jin li her qadê di aliyê siyasî, leşkerî û civakî de pêşengiyê dikin û xwedî gotin û biryar in. Îro bi hezaran milîtanên heval Sara li Rojava, Bakur, Rojhilat, Başûr û Ewropayê li ber xwe didin. Niha li Rojava bi sedan ruhên mîna Sarayê ku bûne Arîn Mîrkan li hemberî hovîtiya DAIŞ'ê li ber xwe didin di çeperên şer de. Tu kedeke heval Sara vala neçûye, îro roj ew tovê ku beriya 40 salan hatiye çandin li cîhanê deng vedaye û bûye dengê hemû jinên cîhanê. Sarabûyîn ev e.

GEŞBÛN KARA / ZERYA CÎLO - AMED

Dizanim, îro Mûnzûra bi salan e rondikên dayika ve diherikîne pir xemgîn e, ew çiyayên bêhna xeyalên te yên zarokatiyê jê tê, îro ji bo te rondikan dibarîne û dibêjin ne ji bo keça Dêrsimê, ev veger ne bû, ji ber ku ev veger pir zû bû. Erê jina Dêrsimê ya şoreşger, tu yê bikevî nav gotinên dengbêjan jî. Ew dengbêjên dilovan, bi salan êşên kurdan, evînên bêziman vegotine, ew ê vê carê di nav kilamên xwe de behsa berxwedana te bikin, car behsa xweşikbûna te, car behsa ronakbûna te, car jî behsa rûkeniya te, bi hêviyên mezin mêzekirina te bikin. Ew ê bibêjin ew jin evîndara Kurdistanê bû, evîna wê, evîna Derwêş û Adûlê bû, ew çîrokeke bêdawî, straneke dilgîr bû, ew jineke wêrek bû, bi sekna xwe, bi heybeta bejn û bala xwe di dilê dijmin de bûbû tirseke mezin. Bi peyvên xemilandî, dilê te yê xwedawendî bû navê bi sedan zarokên nûbûyî.



Tu wek kûlîlkê di nav dilê kurdan de şîn bûyî. Wekî ava rengxweşik a Basya û Avaşîn xemilî û bi heybet, wekî ava Dîcle û Firatê zelal, wekî Mûnzûra xweşik, diherikî ji Dêrsimê heta çiyayên azad ên Kurdistanê. Tu sond û peymana Seyîd Riza, tilîliya li ser zimanê Besê û Zarîfeyan bûyî. Wekî desmala destê dayikan a di serçopiyan de dihejiyayî. Ew jinên ku bi ruhê Bêrîtanan li hemberî dijmin li ber xwe da û xwe bi kendalan de avêtin xwar. Tu wekî evîna Zîlanê; ew Zîlana di nav dilê dijmin de parçe parçe bûyî, wekî agirê bedena Sema û Rahşanan germahiya azadiya jinan dihewand di dilê xwe de. Dizanim ew jinên qehreman, ew jinên bûne tirs û xofa dilê dijmin, bi hezaran jinên ku navên wan nayên zanîn te pêşwazî kirin, bi hezaran zarokên navê wan bûn Sara û Sakîne. Tu ji wan çavên ku dilê te yê xweşik di nav de xuya dike, li wan mêze dikî, bi devekî biken û serbilind, bi hesreta hezar salan wan hembêz dikî. Di wê hevdîtina dîrokî de, derdora we kulîlk reng bi reng vedibin.

Erê fermandara hêja, zelalbûna te dê bikeve nav rûpelên dîrokê. Her kêliyeke serhildêriya te û berxwedana te dê peyv bi peyv bê nivîsandin. Îro şûnde gul û kulîlkên çiyayê Qendîlê, bi guldexwînên çiyayê Zagrosan bi banga karxezalên çiyayên Dêrsimê ji bo te dike hawar, ew çiyayên ku rêhevalên te di nav hembêza xwe de vedişêrin, ew ê bêhna te bi lez û bez, di nav pêlên çemê Mûnzûrê de wekî govenda Amedê çepkanî bi lez û bez, wekî tilîliyên jinên Botanê bi dilxweşî bigihîne rêhevalên te.

### DIJMIN FETISAND

Erê jina serbilind, Xizir serê zarokên Dêrsimê daye ser çoka xwe û bi navê Duzgun Baba têlên tembûran jî di destê keçên Dêrsimê de, gotinan ji bo te dinivîsin, ji zarokan re lorîkan dibêjin, ji civata pîrên di cemên Dêrsimê de dibî sergotin. Erê civata hazir, ez ê îro behsa jinekê bikim ku dîrok daye nivîsandin û daye şermê. Ew jin bi egîdiya xwe bi nav û deng bû. Di nava dilê xwe de azadbûna tevahiya jinan bi cih kiribû. Bibêje ew jin jineke ew qas bilind bû ku wekî xwedawendan bû. Wê jinê dijminê hov û xwînxwar bi tifa xwe fetisandibû. Ew qîrînek bû, ew qîrîn bûbû bersiva qîrîna zarokên Dêrsimê, bersiva jinên Dêrsimê yên qehreman, bûbû bersiva jinên ku bi hezaran salan êşê dikêşin. Wê jinê tu car li hemberî dijmin serê xwe netewandibû û dê çawa li hemberî nîrê dagirkeriyê û mêtingeriyê serê xwe rakin, nîşan dabû.

### BÛ DENGÊ QEHREMANAN

Erê zarokino, ew jina hêja di temenê we de evîndara çiyayên Dêrsimê bû. Xeyalên xwe yên ciwantiyê di girtîgeha Amedê de bi Mazlûman re parve kiribûn, cesareta xwe jî ji şoreşgerê efsanewî, hêviya kurdan Xeyriyan girtibû. Gotin û vegotinên xwe yên watedar jî ji Kemalan girtibûn, hêvî û mezinbûna artêşa xwe jî ji dengê zarokên kuçeyên Rezanê yên ku li derdora dîwarên girtîgehan baz didan. Bi axîneke mezin ew ê bibêje erê Saraya bejnzirav û bilind, asî û çavxezala wêrek Sara. Ma kî dikare behsa kesayetiya te bike, ma kî dikare te bi gotinan bîne ser ziman, ma kî dikare? Tu dikarî behsa her kesî bikî, lê her kes nikare te bîne ser ziman, çi qas bîne ser ziman jî dê kêm bimîne. Ey evîndara rojê, xeml û geşahiya Kurdistanê Sara. ***(Bi dawî bû)***

## Ji ronahiyê TÎRÊJEK

**SARAYÊ,** jina rûken û delaliya çiyayên azad, bi têkoşîna xwe pêşengî ji şoreşa jinan û Tevgera Azadiya Gelê Kurd re kir. Pênasekirina Sarayê cesaretek û wêrekiyeke mezin dixwaze. Heval Sara çîrokeke bêdawî ya li welatê me ye. Di dîroka 40 salan a têkoşîna azadiyê de heval Sara xwedî jiyaneke bêhempa ye. Her nêrîneke wê ya li jiyan, civak û derdorê bi xwe re tiştekî nû diafirand û diguhert. Her kes nikare bibe xwedî çîrokeke ev qas bibandor û tijî berxwedan. Heval Sara tîrêjek ji ronahiyê bû ku ji warê berxwedanê Dêrsimê derketibû. Heval Sara bi taybetî ji bo jinên azad û ji bo hemû jinên li cîhanê têkoşîn dida. Di nava têkoşîneke ew qas zor û zehmet de jî tu caran ji têkoşîna xwe tawîz neda. Ev yek li girtîgeha Amedê li dijî wê zilma cûntayê îspatî her kesê kir. Loma tevgera ku bi çend kesan dest pê kir, di roja îro de gihaştiye milyonan. Kesayetên mîna hevala Sara, Zîlan, Bêrîtan, Sema, Rahşan, Ronahî, Egîd, Mazlûm, Kemal, Xeyriyan destana qehremaniyê nivîsîn û ev destan nîşanî hemû keç û xortên gelê kurd kir. Niha di nava têkoşîna gelê kurd û civaka kurd de bi hezaran navên van lehengan di çeperên pêş ên têkoşînê de li ber xwe didin.



www.arsivakurd.org

## Jinên ciwan pêşangehê vedikin

**DI DEMÊN DAWÎN DE** li başûre Kurdistanê di aliyê çand û hunerê de xebatên jinan gelekî derdikevin pêş. Gelek jinên ciwan hatin gel hev û dê di 15'ê mehê de li Hola Emne Sûra ya Silêmaniyê, pêşangeheke hevbeş vekin. Ev pêşangeh ji hêla jinên ciwan ên navçeya Kifrî ve tê vekirin. Dê pêşangeh li Navenda Heftreng a li Hola Emne Sûre 4 rojan vekirî bimîne. Rêveberê Navende Heftreg Bextiyar Seîd diyar kir ku 32 jinên ciwan ên ji Kifriyê, di heman demê de xwendekarên Peymangeha Hunerên Ciwan a Kifriyê ne, dê bi 70 tabloyên xwe beşdarî pêşangehê bibin û ev tişt got: "Yekemîn car e ku navenda me kareke wiha dike. Me divê şiyan û berhemên destê van xwendekaran li Silêmaniyê jî bên dîtin." SILÊMANÎ





## Dîrok hişmendiya civakê ye

Civakên li ser erdnîgariya Kurdistanê dijîn xwedî çandên gelekî qedîm in. Ev cil û berg û dîsa gelek kel û pelên bi hezaran sal e li vê herêmê hatine bikaranîn, xwedî dîrokek bi hezaran salan e. Hêj ev kevneşopiyên dîrokî di roja me ya îroyîn de jî tên dîtin. Gelek berhemên çandê yên ku îro di muzeyan de hatine berhevkirin, di nava wan de kevneşopiyên ji herêma Qersê jî xwedî taybetmendiyên cuda ne. Ev berhemên li Qersê hatine berhevkirin, hemû kel û pelên dîrokî ne û cil û bergên wan jî xwedî taybetmendiyeke girîng in. QERS




## Ristika Morîkan û neynikeke şikestî

Nivîskara jin Fatma Savci piştî pirtûkên xwe yên wekî Gulên Qasid (helbest, 2006), Xewnên Zîvîn (helbest/cerebe, 2007), Bîra Birînê (helbest, 2010) û 'Şewq û Payîz' (cerebe, 2011) herî dawî bi pirtûka çîrokan a bi navê 'Ristika Morîkan' derketibû pêşberî xwendevanên zimanê kurdî. Pirtûka nivîskara jin Savci ya bi navê 'Ristika Morîkan' ji weşanên Avesta derketibû. Di pirtûkê de tê gotin ku 'Ristika Morîkan' neynikeke şikestî li ruhê birîndar ê kurd digere. Neynikeke ku kes nexwaze li sûretê xwe yê winda yê tê de binêre. AMED




## Tu wateya bawernameyê tune ye

Hikumeta AKP'ê ya ku di her rewşê de xwe diavêje ber bextê KHK'an, herî dawî bi KHK'a 3'yemîn deriyê bi dehan komeleyan morh kir û bi sedan akademîsyen ji kar îxrac kirin. Karîkaturîstê rojnameya Evreselê Sefer Selvî di karîkatura xwe de bal kişand ser nîqaşên ku demekî ji bo bawernameya Serokwezîrê tirk Erdogan dihatin kirin. Di nîqaşên dihatin kirin de dihat gotin ku serokomarekî tirk bê bawername nikare bibe serokomar, lê vê ji bo Erdogan tu wateya xwe tune bû. Di karîkatura Selvî de jî ev yek derket pêş: 'Wê demê çi ye? Tu wateya bawernameyê tune ye.' AMED

# Dengbêj Canşah û jiyaneke di tehma kilaman de



**Çanda dengbêjiyê ne tenê qehremaniyên dîroka Kurdistanê gihandin roja me ya îro, di heman demê de li dijî qirkirin, pişaftin û tunekirina çanda kurdî jî yek ji qadên bîr, hiş û parastina nirxan e**

MURAT SEKMEN / AMED

Gelek caran tê gotin ku gelê kurd gelek destanên xwe yên qehremaniyê ne bi nivîskî, bi çanda dengbêjiyê gihandine roja me ya îro. Gelek destanên gelê kurd jî bi dengê dengbêj Mihemedê Canşah hatine vegotin û bi kilama 'Mala Ûsibê Seydo' balê dikişîne ser Serhildana Ûsibê Seydo. Dengbêj Canşah dibêje: "Eman heyla lê dayê, heyla lê dayê, Texsîmayê girega Zîgo digo lêlê Rehîmayê, belkî bila ocaxa romê kor be dayê, Ecela mala bavê min li qelaca li dinyayê, Bihar e li konê Ûsibê Seydo derbekî berdaye bedena lawê wî dadayê…"

Gelek neteweyên li Rojhilata Navîn dijîn di aliyê çand, ziman û muzîka gelêrî de xwedî dewlemendiyeke bêhempa ne. Ji van neteweyan yek jî bêguman kurd in. Kurdên li ser vê erdnîgariyê bi hezaran sal in dijîn, tu êrîş û polîtîkayên qirkirinê neman li dijî wan neyên meşandin, çand û zimanê wan hat pişaftin. Hatin sirgûnkirin, li ser rêyên koçberiyê gelek ji wan ji birçînan mirin. Ev polîtîkayên qirkirinê çawa duh bi destê dewleta tirk, Îran, Sûriye û Iraqê dihatin kirin, îro jî berdewam in. Bi taybetî li bakurê Kurdistanê ev hovîtî bê navber îro jî di meriyetê de ye. Di demên dawîn de bi girtin û xespkirina saziyên kurdan ev pêla tunekirinê bi destê AKP'ê hêj kûrtir tê meşandin.

Ji ber van polîtîkayên qirkirinê yên ku bi salan e bi destê dewleta tirk tê kirin, gelek berhemên çanda kurdî jî hatin talankirin. Dibe gelek dengbêj û stranbêjên wekî Şakiro, Zahiro, Kerapêtê Xaço, Meyremxan, Eyşe Şan û hwd. bên zanîn, lê gelek dengbêjên wekî Mistefayê Kor, Seyîdxanê Kal, Mistefayê Xeloyê Heyran, Resoyê Ûsiv û Mihemedê Canşah pir kêm tên zanîn. Me xwest di vê nivîsê de em balê bikişînin ser Mihemedê Canşah.

Canşah di sala 1933'yan de li gundê Delîklî yê girêdayî Qereyaziya Erziromê hatiye dinê. Canşah dibistana seretayî û navîn li wê herêmê xwendiye û jiyana wî demekê li wir derbas dibe. Lê ji ber hin pirsgirêkan di sala 1970'yan de diçe Almanyayê. Bi qasî 17 salan li Almanyayê dimîne. Mihemedê Canşah bi gelek dengbêj û hozanan re kilam gotine û bi taybetî bi dengbêj Şakiro re gelek kilam avêtine ber hev. Canşah bi xwe jî şagirtê Mistefayê Xeloyê Heyran e. Mistefayê Xeloyê Heyran jî ji gundê Kazicelaleyê yê Qereyaziya Erziromê ye û hema bêje mamosteyê hemû dengbêjên vê herêmê ye.

**DÎROK Û ÇANDA KURDÎ**

Klam û stranên Mihemedê Canşah zêdetir li ser dîrok û çanda kurdî ne. Piştî bi salan li derveyî welat dijî û kilamên xwe tîne ziman, di dawiyê de vedigere welatê xwe. Dema dengbêj Mihemedê Canşah tê gotin, tenê kilam û stran nayên bîra kesên wî nas dikin, di heman demê de bi sohbet, tevlibûna şîn û şahiyan jî kesekî gelekî nêzî civakê ye. Li gorî agahiyên kesên wî nas dikin, kesekî gelekî xêrxwaz e û bi berdêla pereyan tu kaset tijî nekirine û ne jî bi pere ji kesî re kilam gotine. Navê dengbêj bi xwe Mihemed e, lê bavê wî wekî Canşah wî pênase dike. Canşah piştî demekê li welat dimîne, di sala 1999'an de koçî Stenbolê dike û di sala 2003'yan de li Stenbolê diçe ser dilovaniya xwe. Mezelê Canşah li navçeya Sultangaziyê ya Stenbolê ye.

**NEBIYEN ÛSIBÊ SEYDO**

Gelek berhemên dengbêj Mihemedê Canşah ji hêla fîrmaya Ozyildiz Muzîkê ve li Stenbolê hatine tomarkirin. Xwediyê Ozyildiz Muzîkê Orhan Erdal e. Rêveberên vê fîrmaya muzîkê bi rê ve dibin, aşkera kir ku ew nebiyên Ûsibê Seydo ne. Wekî gelek kes jî dizane eşîra mala Ûsibê Seydo di serhildana Agiriyê de xwedî nav û deng in.

Piştî qehremaniyên di dîroka Kurdistanê de li dijî nebiyên osmaniyan derdikevin pêş, ev qehremanî bi kilamên dengbêjan heta roja me ya îro hatine. Bêguman dengbêj Canşah jî li ser serhildana mala Ûsibê Seydo kilam anîne ziman. Nebiyê Ûsibê Seydo Orhan Erdal aşkera kir ku dengbêj Canşah li ser serhildana kalê wan gelek kilam gotine, ew jî ji bo minetdariya xwe ya ji bo dengbêj Canşah, wan gelek kilamên wî berhev kirine û kasetên wî çap kirine. Erdal der barê dengbêj Canşah de hêstên xwe wiha tîne ziman: "Em ne wek fîrmaya Ozyildizê, wek nebiyên Ûsibê Seydo em Mihemedê Canşah bi hurmet bi bîr tînin. Xwedê wî bi bihûşta xwe şad bike. Bêguman kurê wî Remzî û nebiyê wî Kenan Aslan jî di aliyê berhevkirina berhemên wî de gelekî bûn alîkar û îro ev berhem gihaştine gelê kurd e hêja. Em ji wan re jî spasiyên xwe dikin."

### Kilamên bi dengê Canşah olan didin

**GELEK KILAMÊN** bi taybetî li ser serhildan û kesayetên kurd hatine gotin, îro bi dengê dengbêj Mihemed Canşah olan didin. Hin kilamên ji hêla Canşah ve hatine gotin wiha ne:

- Helîm Can
- Keleha Mêrdînê
- Berxê Mala Paşê Miletê Sarîsyê
- Rêya Helebê Çi Qas Dûr e
- Zavayê Sê Roj û Sê Şevan
- Silêmanê Ehmed
- Gula Min hey wayê
- Erziroma Şewitî
- Rizayê Tahir
- Bavê Ehmed Koroglî
- Mala Ûsibê Seydo
- Bavê Mihemed Reşîd
- Kewa Min a Hêşîn û Bedew

# Fûara pirtûkan didome

Fûara pirtûkan a Çukurovayê ku her sal tê lidarxistin, bi sedan weşanxane bi sed hezaran pirtûkan beşdarî fûarê dibin. Dê îsal 10'emîn Fûara Pirtûkan a ÇukurovaYÊ bê lidarxistin. Fûara ku di 7'ê çileyê de dest pê kir, dê heta 15'ê mehê didome. Di fûarê de bi qasî 300 nivîskar jî beşdar dibin û bi giştî dê 70 çalakî bên lidarxistin.

Fûar li Navenda Kongre û Fûarê ya Navneteweyî ya TUYAP'a Edeneyê ji weşanxaneyan re malovaniyê dike. 10'emîn Fûara Pirtûkan a Çukurovayê îsal gelek nivîskaran pêşwazî dike. Tê payîn ku gelek çalakiyên wek panel, gotûbêj, şahiyên ji bo zarokan jî bên lidarxistin.

Di serî de ji Amed, Stenbol, Enqere û Îzmirê nêzî 250 weşanxane û rêxistinên civakên sivîl tev li fûara pirtûkan dibin. *EDENE*





### Aram li Edeneyê ye

**GELEK** weşanxaneyên kurd jî di fûarê de cih girtin. Weşanxaneya Aram jî ku di demên dawîn de gelek pirtûkên giranbuha çap kirin, di Fûara Pirtûkan a Çukurovayê de cihê xwe girt.

www.arsivakurd.org

# Gerîla hetkarî dano xopawitişê YBŞyî

**Endamê Konseyê Caardişî yê KCKyî Mustafa Karasuyî derheqê krîzê ekonomîkî de va sedemê krîzê ekonomîkî polîtîkayê Erdoganî û dişmenîya kurdan o. Eke şer giran bibo do netîceyê ci de krîzê ekonomîkî kûr bibo**



ROJBÎN DENÎZ / BERFÎN BAGDU / BEHDÎNAN - ANF

Endamê Konseyê Caardişî yê KCKyî Mustafa Karasuyî derheqê krîzê ekonomîkî yê Tirkîya, bedilîyayîşê qanûno bingeyî û pêvînayîşê ke mabênê Anqara û Bexda de virazîyenî de vînayîşê xo ard ziwan.

Karasuyî taslaxê qanûno bingeyî ke hetê AKP û MHPyî ra ya ameyo amadekerdiş ser o wina va: “Nika Tirkîya de xebatêk qanûno bingeyî esto. Wazenî qanûno bingeyî de 20 madeyan bibedilnî; no yeno manaya qanûno bingeyîyêko newe. Ê wazenî qanûno bingeyî yê 12ê êlule restore bikerî û qanûno bingeyêko winasî bivejî. Xora Rayberîya ma pawitiş-nameyê xo de vatbî ke AKP wazeno qanûno bingeyîyêko sey 12ê êlule bivejo. AKP nika nêyî MHP reyde virazeno. Verê cû AKPyîyan bi xo vatênê ‘wextê derbe û rewşa îstîsnayîyan de qanûno bingeyî nîno viraştiş’ labelê ewro ê bi xo vejenî. No qanûno bingeyî sere ra seqet o û meşrû nîyo. Wazeno wa sera 80-90 hetê şarî ra bêro tesdîqkerdiş, reyna zî meşrû nîyo. Yeno zanayîş ke Kenan Evrenî sera 95 girewtbî. Qanûno bingeyî ancax mîyanê şarî de, taxan de bêro munaqeşekerdiş û dima ra meşrû beno.”

### FERMANÊ PADÎŞAYÎ

Karasuyî dewamê qiseykerdişê xo de bale ant qanûno bingeyî ser û wina va: “Goreyê ma û heme demokratan çîyo esasî no yo; qanûno bingeyî demokratîk o an nê? Demokratîk nîyo, çimkî selahîyatî heme destê kesêk de kom benî. Qerarnameyê Hukmê Qanûnî (KHK) yenî vetiş; KHKyî bi xo sey fermandayîşê padîşahî yo. Ganî şarê kurd vera nînan de bivindero, xora yê ke problemê kurdan çareser nêkero, nêbeno demokrat. Goreyê ma munaqeşekerdişê nê qanûno bingeyî daxî bêmana yo. Çîyo ke kurd wazenî, qanûno bingeyîyêko newe yo; yanî sere ra heta peynî bêro newekerdiş. Eke sere ra heta peynî ruhê qanûno bingeyî nêro bedilnayîş, o wext no antî demokratîk beno. No qanûno bingeyî kurdan red keno; nê semedî ra ganî kurdî zî vera ci de bivinderî. Qebulnêkerdişê kurdan û yê hetanê bînan yewbînan ra cîyayêr o. Senî ke sera 60-70ê çewligijan qanûno bingeyî yê 12ê êlule ra vatbî nê, ganî kurdî zî sey çewligijan ewro vajî nê.”



### ŞER KRÎZÎ KÛR KENO

Karasuyî va ‘sebebê krîzê ekonomîkî sîyasî yo’ û wina domna: “Tirkîya de serranê peyênan de tayê averşîyayîşê ekonomîk bîy. Nê averşîyayîşî zî saya ma de bî; yanî seba ke ma şerî vindarna, bî. Eke ma sey serranê 90î şer bidomnayêne, ekonomîya Tirkîya do birijîyayêne. Pêrodayîşê serranê 90î krîzê ekonomîkî yê serra 2000î vet orte. Dima ra Tirkîya bi Kemal Dervîş û devaluasyonî xo xelisnaye. Erdogan badê ke 10 serrî kurdan reyde şer kerd, ame duştê OHALî. Erdoganî nika reyna vera kurdan de şer îlan kerdo. Şero ke vera kurdan de bêro kerdiş, yeno manaya krîzê ekonomîkî. Wexto ke şer çinêbî, Sûrîye, Îran, Rûsya û sewbîna reyde têkilîya înan baş bî û ekonomî zî baş bî. La nika şer dest pêkerd û hemînan reyde têkilîyî xira bîyî. Nika bajaran de bombeyî teqenî, tewr peynî Reîna de hêriş virazîya. Êdî turîstî zî nînî Tirkîya û do Tirkîya hetê ekonomî de birijîyo.”

### DAGÎRKERÎ SUC O

Karasuyî dîyar kerd ke yê ke beno sebebê krîzê ekonomîkî polîtîkayê Erdoganî yî û wina va: “Serekê Sererkanê Pêroyî, Serekwezîr û Serekkomar vanî ke heta ti kes nêmano ma do hemînan bipelçiqnî. Yê ke beno sebebê krîzî no yo. Ti kamî pelçiqnenî? Ma vera to de mêse esta ke ti pelçiqnenî. To ra ver çend hukmatî ameyî û şîyî. No problem seserrî yo ke esto. Ti senî eşkenî bipelçiqnî? Vatişê ez do kurdan bipelçiqna, yeno manaya qirkerdişê 40 mîlyon kesan. Tirkîya wazena kurdan qir bikera; ma qey qirkerdiş suc nîyo? Wazenî Amerîka û Ewropa zî bikerî ortaxê qirkerdişê xo. Ez tîya ra hişyar kena; wa Amerîka û Ewropa nêbî ortaxê nê qirkerdişî.”

### PERE ŞONO TIRKÎYA

Karasuyî qiseykerdişê xo de va ‘krîzê ekonomîk do heta wisarî bivejîyo duştêko tewr berz’ û wina va: “Nika çîyo ke destê Tirkîya rehet keno, petrolo ke Başûrê Kurdistanî ra yeno yo. Ez eşkena vaja ke petrolo ke Başûrê Kurdistanî ra vejîyeno, sera 70ê ci şono Tirkîya rê. Ancax sera 30 kurdan rê maneno. Tirkîya pereyê Başûrî wena. Bêxera Başûr cayo ke destê Tirkîya rehet bikero, çin o. Tirkîya seba ke nêyî dî, vera xo da Sûrîye û Ebadî. Erdogano ke çend aşmî ra ver Ebadîyî ra vatbî ‘kalîbreya to çiqas a, ti duştê mi de nîyî’ labelê nika telefonê ci keno û ci ver de lebîyeno. Demek kalîbreya to zî hende ya, ti zî wina yî. Çareserîya krîzê ekonomîkî, çareserkerdişê problemê kurdî reyde mumkun o. Eke problemê kurdî nêro çareserkerdiş, o wext do Tirkîya îflas bikera.”

### TI KES VÎR NÊKENO

Karasuyî peynîya qiseykerdişê xo de qala dişmenîya ke vera PKKyî de beno, kerd û wina qedêna: “PDK ewro her ca de dişmenîya kurdan keno û dano kerdiş. Îraq ser de zextan keno û vano ‘eke ti wina nêkerî, ez do dewletêka xosere awan bikera.’ Yê ke mabênê Tirkîya û Îraq de mabênkarî keno, PDK yo; çimkî seba awankerdişê dişmenîya PKKyî wina keno. Nika Tirkîya, PDK, Amerîka û sewbîna zaf hetî do vera PKKyî de ca bigirî. Çimkî dostanîya Îraq û Tirkîya wina rehet nîya. Yê ke Îraq kerd nê halî kam o? Yê ke Mûsilî teslîmê DAIŞ kerd kam o? Yê ke Sûrîye û Îraq zî kerd nê halî, Tirkîya ya. Gelo do nêyî bêrî vîrîkerdiş? Nika seba menfîetanê xo ameyî têhet. Ganî ti kes bawerîya xo nînan rê nîyaro.



## Mabênê Bexda û Tirkîya de têkilî estî

**KARASUYÎ VA** ‘çîyo ke Sûrîye de bî, ewro Bexda û Îraq de zî beno’ û qiseykerdişê xo rê wina dewam kerd: “Erdoganî waştêne Sûrîye birijno û Esadî îqtîdarî ra bierzo û bi no hawa do bibîyêne awankarê Sûrîye, la wina nêbî. Nika Tirkîya Sûrîye, Îraq û Rojhelato Mîyanên de aktorêko winasî nîyo. Nika tena yew hedefê Tirkîya esto; o zî tasfîyerkerdiş û pelçiqnayîşê kurdan û çinkerdişê kantonan o. Cok ra Tirkîya nika Îran û Rûsya reyde têkilî ronena. No zî yeno manaya qebulkerdişê Esadî. Nika zî eynî çîyî seba Îraqî keno. Seba sînorkerdişê PKKyî şono hete Ebadîyî. Tirkîya verê cû vatbî ‘ma Lozan nêşinasnenî’ labê dima ra tersaye û rolê awankarî ra fek verada.”

## Vera kurdan de bazarî

**KARASUYÎ VA** ‘Tirkîya vizêr Başîka de seba Mûsilî tehdît bîye’ û qiseykerdişê xo wina domna: “ Mûsil nêşîna bikero, ewro vanî ma senî PKK Şengal ra bivejî? Ewja de PKK çin o. Gerîlayî seba hetkarîdayîşî şîyî Şengal. Êzidîyan meclîsê xo û dima ra YBŞ awan kerdî. Ewja de YBŞ û gerîlayî estî. Raştîya xo de problem gerîla û PKK nîyo, xeta Rayberî ya. Çimkî xeta Rayberîye êzidîyan fermanî ra xelisnaye. Êzidîyî îdareyêko ke Rayberîye ra girêdaye awan kenî.



Karasuyî wina va: “Ewja de êzidîyî hewl danî sîstemê xoserî awan bikerî. Tirkîya zî wazena nêyî orte ra wedarna. Seba nêyî ra wazenî bikewî Şengal û cok ra Tirkîya şona Ebadî ver. Nizdîbîyayîşê Îraq û Ebadîyî zî raşt nîyo. Heta vizêr zî mabênê înan de dişmenî estbî, la ewro PKK ser ro bazarî kerdiş, eyb o. Ma Amerîka û her kesî hişyar kenî. Wa ti kes PKK ser ro bazarî nêkero. No çîyêko teberê merdimî de yo. Dewletê ke PKK û qirkerdişê kurdan ser ro bazarî bikerî, ci ra xêr nêvînenî. Hele erdê Rojhelato Mîyanên de ti xêr ci ra nêvînenî; çimkî erdê Rojhelato Mîyanên nêyî qebul nêkeno. O wext Sedam zî na şaşî kerdbî. Eke Sedam kurdan reyde pê bikerdêne, nêkewtê na rewşe. Îraq zî nê kerdişanê xo ra xêr nêvînena. Ganî ti kes bawerîya xo ti vatişê dewleta tirk û AKPyî rê nîyaro. Yê ke AKP reyde têkilî rono, xêr xora nêvîneno; çimkî hukmatê AKPyî qilêr o û dişmenê kurdan o. Heme têkilîyanê xo zî dişmenîya kurdan ser ro awan keno.”

# Ma wazenî bibî vengê bindestan

**Cinîya bi nameyê Ayça Tezerîşîra ke rîpelê cinîye yê Rojnameyê Îşçî amade kena, derheqê rojnameyî de qisey kerde û wina va: "Cinîyî nîmeyê nê komelî yî û cok ra ma wazenî bibî vengê cinîyê ke keda înan ser de dagîrkerî yeno kerdiş"**







Rojameyê Îşçî ke hetê Komeleya Cigêrayîş û Kulturî ya Anadolu (AKA-DER) ra bi hawayêko perîyodîk her aşme yeno vetiş, na aşme zî hûmara ci ya 145. vejîya.

Babete ser o Ayça Tezerîşîra ke rîpelê cinîye yê Rojnameyê Îşçî amade kena, qisey kerde.

Tezerîşîre va 'komeleya ma 2001 de Mamakê Anqara de awan bîye' û wina domnaye: "Şûbeya ma ya Kadikoyî zî serra 2009 de ameybî awankerdiş. Nê erdan de zaf şarî pîya cuyenî û kulturê cîya cîya têmîyan kewtî. Cok ra têkoşînê şaran zaf muhîm o. Komeleya ma zî nê semedî ra ameya awankerdiş. Ma ekolojî, cinî, huner û şaran ser de xebatan kenî."

**MA VENGÊ CINÎYAN Î**

Tezerîşîre va 'hedefê ma o yo ke ma rojeva karkeran bi Rojnameyê Îşçî biresnî karkeran' û wina dewam kerde: "Ma bi şîyarê 'ma ferikanê ci nê, dinya heme wazenî' hereket kenî. Ma bi rojnameyî hewl danî rojeva kede biveji aver û merdiman nêyî ser ro zana bikerî. Rojnameyo ke 2004 ra nata vejîyeno de 6-7 embazê ma yê edîtorî estî. Rojname de rîpelê cinîye 2 serrî yo ke bi hawayo nîzamin yeno amadekerdiş. Seba rîpelê cinîyan 3 embazî xebetyenî, labelê ma hewl danî ke heme embazan beşdarê nê xebate bikerî. Ma seba ke cinîyî bişînbî xo îfade bikerî û mîyanê xebatan de ca bigirî, cinîye rê rîpel aqitna. Cinîyî nîmeyê nê komelî yî; cok ra ma wazenî bibî vengê cinîyan."

**MA ZAF QEWETIN Î**

Tezerîşîre qiseykerdişê xo de bale ante ser hedefê têkoşînê cinîyan û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "Ma seba sinifa bindestan têkoşîn danî. Mîyanê nê pelçiqyayîş û dagîrkerî de cinîyî hîna zaf yenî pelçiqnayîş. Vatişêko winasî esto; 'Seserra 21. do bibo seserra xoverdakar û serewedarkaran' Her çiqas Tevgerê Cinîyan bi hawayo vindete bêro vînayîş zî raştîya xo de ma zaf qewetin î. Ma eşkenî ke rojnameyêko cîya zî bivejî. Vilakerdişê nê rojnameyî, mîyanê xebatê rojnameyî de cagirewtiş, viraştişê xeberê rojnameyî seba mi zaf muhîm o. Ma veng danî heme cinîyan; hedefê ma xebatêka koletkîf o, cok ra her kes eşkeno rojname rê nuşte bierşawo."

Şima eşkenî Rojnameyê Îşçî Şûbeyê AKA-DERÎ, buroya Kaldiraçî û zaf kîtabroşan ra temîn bikerî. Şima eşkenî nuşteyan ***iscigazetesi@gmail.com*** ser ro bierşawî. ***STENBOL - ŞÛJIN***

# AKP sîyasetê heyfgirewtişî meşneno

ALÎ KOÇER / DÎLOK - ROJNEWS

Polîtîkayê AKPyî çarçeweya hêrişê qirkerdişê sîyasî de heme bajaranê Kurdistan û Tirkîya de duştêko tewr berz de domîyenî. Bitaybetî tepiştiş û tewqîfkerdişê ke demê peyên de benî zî nîşaneyê nê polîtîkayan î.

Babete ser o Hemserekê HDPyî ya bajarê Dîlokî Erkan Şahînî qisey kerd.

Şahînî va '15ê temuze ra dima bitaybetî zî badê qirkerdişo ke Beybahçeya Dîlokî de qewimîyabî, hukmatê AKP reya ewil merasîmê cenaze de ame şermizarkerdiş' û qiseykerdişê xo wina domna: "Merasîmê cenazeyan de şarî hukmatî sey qatil îlan kerd. Cok ra AKP Dîlok de sîyasetê heyfgirewtişî meşneno. Amed, Mêrdîn, Şirnex û Colemêrg de polîtîkayê rijnayîşî yenî meşnayîş, la Dîlok de konseptêko taybetin yeno meşnayîş. Esnafê ke dikanê xo nêakerdî ameyî tewqîfkerdiş. Îqtîdar nêakerdişê dikanan yê esnafan seba xo tehluke vîneno."

**ŞAR BAŞ ZANO**

Şahînî dewamê qiseykerdişê xo de wina va: "Îqtîdaro ke nêeşkeno reaksîyonanê şarî bigiro, bi hêriş û teqnayîşan wazeno şarî teslîm bigiro. Raştîya xo de ganî vernîya şîdet û hêrişan bigirewtêne, labelê îqtîdar çepê ci de nê hêrişan seba ke muxalefetî bêveng bikero, xebetneno. Şarê ma bi hawayo baş zano ke derheqê înan de çi beno. Cok ra şar viraştişê çalakî û meşîyayîşan ra fek veranêdano û reaksîyonanê xo nîşan dano."



# Ma do ewro zî vera zulmî de xover bidî



Polîtîkayê qirkerdişî Kurdistan de serranê 90î de vejîyaybî duştêko tewr berz. Cinî, huqûqnas, sîyasetmedar û aktîvîstê ke bîbî şahidê o wextî, vanî 'qedexeyê tebervejyayîşî' û OHAL nîşan danî ke eynî polîtîkayî ewro zî dewam kenî.

Babete ser o Kumru Bîlena ke serranê 90î de seba ke sîstemê qorîcîtî qebûl nêkerdbî, mecbûr mendbî ke bi keyeyê xo bajarê Şirnexî ra koçê Wanî kerdbî, qisey kerde.

Bîlene va 'dewlete bin nameyê JÎTEMî de bi fikrê dagîrkerdişî kewte erdê ma' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Ewro bi eynî zîhnîyetî hêrişê Sûr, Cizîr, Şirnex û Nisêbînî kerde. O wextî JÎTEMî polîtîkayê xo bedenê cinîye ser de dayêne meşnayîş û ma o wext raştê teda, zext û îşkence ameyî. Her çiqas ke keyeyê ma ame veşnayîş zî ma qerardar bî ke dewe de bimanî. Yew şewe reyna ameyî eştî keyeyê ma ser de û ma ra vatî 'şima keyeyê xo de PKKyîyan miqate kenî' û keyeyê ma reya dîyine veşnayî. Ma zî mecbûr mendî ke koç bikerî. Ma tena bi cilê ke ma ser de yî koçê Wanî kerd."

**EWRO ZÎ ZULM ESTO**

Bîlene dewamê qiseykerdişê xo de va 'wexto ke ma koçê Wanî kerd, ma xeylê zehmetîyî antî' û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "O wextî Wan de yew cayo ke ma tede bimanî daxî çinêbî. Koçkerdişî ra dima ma cuyayîşê xo de têkoşînê nasname da. Çîyê ke vizêr ma cuyayî, wazenî ewro zî bi ma bidî cuyayîş. Seba ke merdimî erdê xo nêteriknayî, dewlete zulmêko gird merdiman ser de kerde. Ma senî ke verê xover da, ma do nika zî xover bidî." ***WAN - ŞÛJIN***

# Şîrket paweyê qerarê mehkeme nêvindet

Neheqîyê ke karkeran ser de beno her ke şono gird beno. Dewijê dewa Buyukobaya Îzmîrî seba ke şîrketê Îmbat Madencîlîk A.Ş sozê kardayîşî dabî înan û dima ra sozê xo nêard ca, vera şîrketî de çalakî viraştî.

Xebatkaranê şîrketî ra Firat Kaya, Gokhan Ayaydin û Volkan Çetînî zî seba ke hetkarî daybî çalakîyê dewijan 3ê kanûne 2016 de derheqê înan de tehqîqat amebî destpêkerdiş. Îdarekarê şîrketî tehqîqatê karkeran xo rê sey mehne dîyî û karkeran gure ra eştî. Goreyê pêkerdişê Sendîkaya Dev Maden Îş û Polyak Maden A.Şî ti kes nêeşkeno heta 6 aşmî karkeran gure ra bierzo.

Babet ser o Avûkat Aycan Çiçeke qisey kerde û qiseykerdişê xo de bale ante heqê kedkaran ser.

**MA DO QEZENC BIKÎ**

Çiçeke qiseykerdişê xo de bale ante neheqîya ke karkeran ser de yena kerdiş û qiseykerdişê xo de wina va: "Sere ra heta nika vera karkeran de neheqî virazîyenî. Soma ra nata suc yeno kerdiş. Şîrketê madenî bêhuqûqîyê Tirkîya xo rê sey firsend dîyî. Karker seba ke endamê sendîka yî gure ra yenî eştiş. No nîno qebulkediş. Ma do neheqî ver de bêveng nêmanî. Ma do bi tesilî qezenc bikerî." ***ÎZMÎR - DÎHABER***



# Do têkoşînê ma bidomîyo

Hêrişê sîlehin yê Reîna ke qezaya Ortakoyî ya Stenbolî de virazîyabî ra dima endamê Halkevlerî waştbî ke Okmeydani de seba laîktî vengdayîşê têkoşînî bikerî la hetê polîsan ra ameybî tepiştiş û dima ra zî tewqîf bîbî. Vera nêyî de zaf bajaran de hema zî protestoyî yenî kerdiş.

Endama Halkevlerî ya Edene Dîlara Akgoze babete ser o qisey kerde.

Akgoze va 'Tirkîya ver bi kaosêko gird kirancîyena' û wina domnaye: "No proses 7ê hezîrane 2015 de dest pêkerdbî. O wext vera HDPyî de hêrişî ameybî viraştiş. Awanîyê HDPyî, parlamenter û hemserekê HDPyî, çapemenî û muxalîfê bînî yê Tirkîya zî nê hêrişan ra para xo girewtî. Bi hêrişo tewr peynî ke Stenbol de ame viraştiş zî nînan vera xo dayî ma."

**MA ÎNAN ŞINASNENÎ**

Akgoze dewamê qiseykerdişê xo de va 'wazenî Tirkîya biancî mîyanê tarîtîyêk û seba ke ma zî vera nêyî de vindenî, ma bîyî hedef' û qiseykerdişê xo rê wina dewam kerde: "Ma vera cîhadîstê kehenpestî yê AKPyî de têkoşînê laîktî danî. Ma baş zanî yê ke nê welat de gonî rijnenî kam î. Ma zanî ke nê kesî yê ke qatilê cîhadîstan reyde pê kenî yî. Ma zanî yê ke destûr dayî ke TIRê MÎTî derbaz bibî nê yî. Reyna ma baş zanî ke berpirsîyarê nînan yê ke DAIŞî rê berî akerdî û nêweşxaneyan de tecawizkaran tedawî kerdî, nê yî."



Akgoze peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Yê ke vera kaosî de têkoşîn dayî, ameyî tewqîfkerdiş. Beno ke ewro yan zî siba ma zî bêrî tewqîfkerdiş la mîraso ke Hamît û Ayşegule ma rê verdayî, ma do nê mîrasî dewre bigirî û ma do têkoşînê xo yê laîktî gird bikerî." ***ADANA - ŞÛJIN***

www.arsivakurdi.org

ROJEVA
Medya
9 Çile Duşem 2017

**ROJEVA MEDYA**
**Ararat Basın - Yayın**
**Reklamcılık Adına**

İmtiyaz Sahibi:
**Murat SEKMEN**

Yazı İşleri Müdürü:
**Mehmet Çetin ALTUN**
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
***Yenişehir-DİYARBAKIR***

***Tel:*** 0 (412) 224 35 93
Baskı ***(ÇAP):***
***İstanbul:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. ***No:*** 23/A
***Küçükçekmece İSTANBUL***
***Tel:*** 0 (212) 580 63 81
***Adana:*** Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
***No:***13/A ***Yüreğir / ADANA***
***Tel:***0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
***e mail:***
rojevamedya@hotmail.com

## Ji bo jinan perwerdeya KAR Û PIŞTEVANIYÊ




Yekîneya 'Em xwe bi xwe ji bo jinan, armanca ku jin jî tev li jiyana kar bibin û di civakê de bibin xwedî gotin' ji bo jinan perwerdeya bêpere dide destpêkirin. Di çarçoveya projeyê de ji bo jinên ku li Stenbolê dijîn û temenê wan di ser 18'an re ye, bi armanca ku tev li jiyana kar û civakî bibin ji bo 300 jinan bi armanca îstihdamkirinê heta dawiya salê dê perwerdeyê bidin. Jinên ku dixwazin perwerdeyê bibînin heta 15'ê çileyê dikarin li ser navnîşana http://bizbizze.com/ der barê vê perwerdeyê de agahiyan wergirin. **ŞÛJIN**

## Mîdye dibin DEBARA MALÊ



Welatiyên ji ber tengasiyên aborî ji neçarî xaka xwe terikand û berê xwe da Stenbolê, debara xwe bi karên cuda dikin. Hin ji wan di sektora tekstîlê de bi şev û roj dixebitin, hin ji wan bi berhevkirina kaxiz û kartonan debara xwe dikin, hin jî mîdyeyan difiroşin. Li taxa Tarlabaşi ya Beyoglû ya Stenbolê bi taybetî jin di jêrzemînên malên xwe de bi zor û zehmetiyan mîdyeyan çêdikin û pê debara xwe dikin. Jinên ku navoşka mîdyeyan amade dikin, destpêkê mîdyeyan baş dişon, dûre hundirê wan tijî dikin û herî dawî di sîtilan de wan dikelînin. Piştî ku jin bi kîloyan mîdyeyan amade dikin, zarokên wan an jî hevjînên wan, wan mîdyeyan difiroşin. Jinên piraniya roja xwe di jêrzemînan de bi çêkirina mîdyeyan derbas dikin, giliya wan jî hevpar e. Jinan anî ziman ku zabiteyên şaredariyê astengiyan ji wan re derdixin û wiha got: "Zabite pirsgirêkan derdixin. Em bi çêkirina mîdyeyan debara xwe dikin, zabite destûrê nadin. Tên dezgeha zarokan belawela dikin. Mîdyeyan dirijînin. Nahêlin zarokên me bifiroşin. Em tenê dikarin vî karî bikin. Lê dibin asteng."Jinan anî ziman ku zabite ji zarokên wan re dibêjin herin li bajarên xwe kar bikin û wiha domand: "Jixwe li bajarên me derfeta kar hebûya , em nedihatin van deran." **STENBOL - DÎHABER**

## Li Marsê MALA CEMEDÊ




NASA ji bo çûna Marsê xebatên xwe zêde dike. Ji bo ku li Marsê mirovan ji radyasyonê biparêze, amadehiya Mala Cemedê tê kirin . NASA li ser Marsê plansaziya qada jiyaneke nû dike û li çavkaniyên avê digere. Li gorî daxuyaniya ku ji NASA'yê hatiye Mala Cemedê dê çavkaniyan binirxîne û mirovan ji şert û mercên zehmet ên vê gerestêrkê biparêze. Mala Cemedê ku pir sivik e, dê bi rehetî bikarin ji cihekî bar bikin cihekî din. Piştî tê barkirin bi avê tê tijîkirin. Bi çêbûna tebeqeyên cemedê astronotan ji radyasyonê diparêze. Dê ev mal di heman demê de wekî depoya avê jî bê bikaranîn. Dîzaynker diyar dikin ku dê ev mal di heman demê de di maşîneyên Marsê de jî dê bê bikaranîn. **AMED**




**Sûrên keleha Hezoyê ya ku hezar û 600 salî ye û ji aliyê persan ve hatiye çêkirin, ji ber bêxwedîmayînê hem xira bûye hem jî bûye cihê sergo û tiryakêşan**









# Keleha dîrokî bûye cihê *sergo û tiryakêşan*

Keleha Hezoyê ya li navçeya Hezo ya Êlihê, yek ji wan kelehên girîng e ku li herêma Erzenê ku di navbera Heskîf, Sêrt û Farqînê de cih digire. Keleh, piştî zayînê di sala 416'an de ji bo xanedana persan wek navendeke olî li ser girekî hatiye avakirin. Vê keleha ku malovaniya gelek şaristanî û şeran kiriye, niha roj bi roj hildiweşe.

Sûrên ku keleh dorpêç kiriye bi demê re ji ber sersariyê rûxiyane û her wiha keleha hundirîn jî bi heman çarenûsê re rû bi rû ye.

Niştecihên taxa Kaleyê got ku keleha Hezoyê ya bi salan e nehatiye restorekirin, bi rûxandinê re rû bi rû maye. Welatiyê bi navê Seyda Abdulselam Basutçu yê ku keleha Hezoyê wek remza xerziyan pênase kir, anî ziman ku ev keleha ku bi hezar salan e li ser piyan e malovaniya gelek şaristan, dewlet û çandan kiriye û wiha got: "Em naxwazin keleha me bê rûxandin. Heta niha ji bo kelehê tenê pêlekanên hesinî hatine çêkirin. Lê ev têrê nake, divê keleh li gorî esl û feslê xwe bê restorekirin."

Basutçu destnîşan kir ku heta niha ji bin keleha dîrokî gelek berhemên dîrokî hatine derxistin û lê hîn berhemên ku di bin kelehê de derneketine holê, hene û ev tişt anî ziman: "Li kelehê hîn gelek berhemên derneketine holê hene. Li kelehê, tuneleke avê hat dîtin. Di bin kelehê de rêyeke dirêj a heta keleha Qendîlê diçe, heye."

**NAVENDA TIRYAKÊŞAN**

Keleha dîrokî ku heta niha tu xebatên restorekirinê lê nehatine kirin, hundirê wê veguheriye sergoyê. Ji aliyê din ve jî defîneger jî li hundirê kelehê gelek caran li zêran geriyane û ji ber vê yekê gelek deverên kelehê hatine rûxandin. Her wiha keleha dîrokî tenê nebûye sergo, ji aliyê din ve jî bûye navenda tiryakêşan. ***ÊLIH - DÎHABER***




# Wênekêşê ajalên ku nifşên wan tune dibin



Wênekêşê xwezaya wehşî Joel Sartore yê amerîkî ji bo rizgarkirina ajalên ku nifşên van wan tên tunekirin, wêneyên wan ên balkêş dikişîne. Sartore beriya nexweşiya hevjîna xwe ku teşhîsa pênceşêra pêsîran lê hatibûn kirin, li kovara National Geographic de wekî wênekêşê xwezaya wehşî dixebitîn. Lê piştî nexweşiya hevjînê xwe ji bo tedawîkirina wê ji cihê karê xwe ji bo salekî destûr wergirt. Sartore di nav salekê de wêneyên ku kişandine di ber çavan re derbas kirin û ji bo afirandina hestiyariyê li ser ajalan dest bi xebatê kir.

Sartore diyar kir ku ew ji bo bala mirovan bikêşe ser ajalên ku nifşên wan tune dibin, dest bi karekî wisa kiriye û anî ziman ku heta niha wêneyên ajalên ku di bin esaretê de yanî di nav xwezaya xwe de nehatine dinê, kişandine.

Her wiha Sartore heta niha li 40 welatî nêzî 6 hezar cureyên ajalan kişandine. ***AMED***









www.arsivakurdi.org